



Îmam Gassan Solomon:

**Divê kes nebeje:
Qet çênabe**

Nûçe:

Bêyî PKK'ê xeta neftê
nayê danîn

Rûpel 3

Cotkar:

Divê gelê êzdî li dozê
xwedî derkeve

Rûpel 4

Celalettin Yöyler:

Gelo her kesê xwendî û
nivîskar rewşenbîr e?

Rûpel 5

NAVEROK



7

Memed Drewş: Kîştóxê Metînî jî viradiyay



11

Azad Avaşîn: Bi zimanê tipanê "Bazîd"



13

Dilgeş Selçuk: Li ser kurdan xebateke akademîk

Ji Xwendevanan

LIGEL sîlav û rêzên hevalbeşî ve nameyê, ji we re bi rê dikim. Li ser ziman û wêjeyê çend dîtîn û ramanên min hene.

Ji mêj ve em dibêjin ziman, wêje û huner, gelek kesên me gava ku radihêjin pêniusa xwe an saz û kilamên xwe, bedewbûn û dewlemendiya kurdî tînin rojevê, lê mixabin tiştên ku dibêjin tenê di gotin û daxwazê de dimînin. Kesên bi vî rengî ku li ser ziman dixebitin û ji bo pêşketinê hewl didine xwe, pir hindik û kêr in. Zimanekî hevpar, pêwîst e. Ev jî bi xebateke kûr û dirêj û kesên di mijarên xwe de pîspor e dixwaze, da ku ji her çar aliyên welat berhevkirinan binin, li navendeke wêkî instituyê kom bikin û bi vî riyê jî, ji ferhengokan bigirin ta bigihêje rêziman, li ser çar bi çar babetan pirtûk bîn nivîsin. Ziman heta ku em pê karibin, divê xwerû, xweser û paqij be. Çi di warê wêjeyê de, çi jî di warên din de be. Hûn jî dizanin ku zimanekî tevlihev, hîzr û ramanê jî tevlihev dihele, heviya dahatîyeke azad nade mirov.

Îro em hûna di serê rîya çareserkirina pirsgerêkan de ne. Ji ber wê jî heta çend salên din, dê emê karibin li ser çewtî û şaşiyên xwe bisekinin û wan yegerînan rîya rast û dirustiyê. Ez hûna derfet û çareyan dibînim. Lê ku ji îroj de em nexebitî, dê ev çewtî û şaşî her mezin bibin û wê rojek we re ku em nema karibin ji bin rabin.

ROJNÛR BÎLAL

W

Çete û ronahî

SAMÎ TAN

Çeteyên Susurlukê dîsa hatin rojevê. Kesên ku bi kuştina gelek kesên tîn sûcdarkirin û bi xwe jî ve yekê dipejirînin. Ji aliyê dadgerên DGM'ê ve hatin berdan. Li hemberî ve yekê jî reaksiyona derdorên demokratîk bilind bû. Niha jî nû ve qala destpêkirina çalakiya "Deqîqeyek tarîfî ji bo ronahiyeke timî" tê kirin. Kesên ku çalakiyê didin destpêkirin, diyar dikin ku wê çalakî di 30'ê mehê de ji nû ve dest pê bike. Her wiha tê ragihandin ku îcar heta mûafiyeta Mehmet Ağar û Serhat Bucak neyê raqirin, wê çalakî bidome.

Li aliyê din, her roja ku derbas dibê, bêhtir kesan tîne-ser gotina siyasethanên kurd: "Heta şerê kirêt neqede, karê dewletê jî bi çeteyan naqede. Lewre jî kes nikare dewletê ji nav destê çeteyan derxe." Helwesta desthilatdarên dewleta tirk a li hemberî çeteyan piştî çalakiya Trêna Aştiyê guherî. Hikûmeta MGK'ê di rojên xwe yên pêşîn de çend gotinên nermik li ser kêşeya kurd kirin, paşê vegerin ser helwesta xwe ya berê. Bi destpêkirina çalakiya Trêna Aştiyê re jî, dengê ber-

devkên çeteyan û generalan bû yek. Rayedarên MHP'ê ku ji zû ve deng jê dermediket, dengê xwe yê şovenîst berz kirin. Digel ve yekê çapemeniya tirk a ku qaşo doza civaka paqij dikir, li hemberî çalakiyê helwesta xwe tûjtir kir û Trêna Aştiyê ji nişka ve bû "Trêna PKK'ê", "Trêna Sevrê".

Piştî kû endamên çeteyan ji hêla DGM'ê ve hatin berdan, nixandina nêzikîrîna rastiyê Mahir Kaynak kir. Di televîzyona Fetullah Gülen de ev nixandî kir: "Pirsgerêkên siyasî li dadgehê çareser nabin, ancax li qada siyasî çareser dibin. Wisa xuya ye ku şerê artêş û polîsan ku hatin û lewre jî ser bûyera Susurlukê tê girtin. Divê bê gotin ku ev çete encama şer in. Hinek got ku li dijî PKK'ê bi riyên legal şer naçe serî, lewre dest avêtin azîneyên li derveyî zagonan. Lê di vî warî de jî bi ser neketin, PKK jî berê ne qelstir e." Dema mirov bala xwe dide endamên çeteyan jî heman rastî derdikeve holê. Bo nimûne Tansu Çillerê da zanîn ku bi girtina van kesên, têkoşîna li hemberî PKK'ê darbe xwariye. Kesên mîna İbrahim Şahin û Mehmet

Ağar jî tim didin zanîn ku ew cengawer in, bi saya serê wan Tirkiye parçe nebûye.

Li hemberî ve rastiyê divê mirov pî bide ser kesên ku doza "civaka paqij" dikin ku bêyî çareserîya kêşay kurd, dawî li çeteyan nayê. Kesê ku bibêje kuştina kurdan rewşa ye, lê diviyabû Ömer Lütfü Topal nehatana kuştin, tu car nabin dostê gelan, divê mirov rûyê kesên wiha derxe holê.

Li aliyê din her ku diçe tîkiliya artêşa tirk a di karên kirêt de jî diyar dibê. Îro gelek kes ji Serkaniya Giştî ya Artêşa Tirk dixwazin ku ew hin xalên ne diyar, rohnî bike. Îro gelek nivîskar didin zanîn ku dewlet bi temamî ketiya bin kontrola çeteyan. Her wiha tê gotin ku artêş jî di nav karên kirêt de ye. Rewş gelekî zelal dibê, ew yek derfetên baş dixê destê gelê kurd. Pêwîst e berî her kesî beşdarî kurd ve çalakiya ku wê di 30'ê rezberê de dest pê bike, bibin û mafên xwe yên binge-hîn bin rojevê. Divê em bi serê hinekan ku heta kujerên Apê Mûsa neyên girtin, berpîrsên bi hezaran kuştinên li Kurdistanê neyên sizakirin, ew çete wê sibe kolanên Enqere û Stenbolê derkevin nêçîra mirovan.

Ve hettîyê derketina rojnameyê rastî salvegera şehîdîketa Apê Mûsa tê, em li vir didin zanîn ku em tu car Apê xwe ji bîr nakin û pêniusa wî li erde nahêlin.

Dijî şerê qirêj seferberiya neteweyî

CEVDET DEMİROĞLU

Dîroka tirkên serdest, bi qirkirina gelan tê nasîkirin û binavkirin, lewre mînaka 'dizê yavuz' li ser van tê gotin. Pergal û dezgehên komara tirk li ser şerê taybet hatiye damezirandin. Îşgalkirina welatê me pêşiyê bi destê artêşê çêbûye. Dagirkeriya wan qirkirin, talankirin, pişaftin û bi vî rengî tunekirina neteweya kurd bû. Ji bo van yekan axa Kurdistanê her dembûye cihê tevkuştinan. Piştî serhildanên Qoçgîrî, Şêx Seîd, Seyîd Rîza û hwd. bi sed hezaran insanên kurd di şikeftan de, gelî, newal û çeman de kuştin. Ji zînanan werkin, dest avêtin namûsa xwişk û dayikên me, zarokên di zikê dayikan de dan ber singû û xerçeran. Kurdistan xwîn digirîya.

Lê belê piştî 70-salî neviyên gelê kurd bîna bersiva nalîn û hawara dilê gelê kurd. Di bin pêşengiya banga karkeran de gelê kurd dest bi têkoşîna neteweyî û civakî kir. Mixabin pêkanînan dijmin dîsa ji berê dijwartir domdike. Armanca û hedefa wan tunekirina me kurdan e. Loma jî bo ku têkoşîna azadiyê bifetisînin, biqedînin çî gemarî ji destê wan tê texsîr nakin. Her roj firoke, balafir, topan, gulan li ser me dibarînin. Dar û ber, zevî û daristanên me agir pê dixin, welatê me wêran dikin.

Xelasbûn, serfirazî û gihîştina armancê, bi mal, milk, can, hemû îmkân û derfet, dil û rih, raman û hest û hwd. beşdarbûna şer diwxaze.

Derfetên jiyane jî holê radikî. Bi vî rengî dixwazin axa me bêmîrov bihêlin. Li bajaran jî insanên welatparêz jî hêla kontra ve tînin kuştin, revandin û windakirin, cesedê wan diavêjin bin pîran. Faşîzma tirk ne tenê li hemberî gerîla, li hemberî gel jî şerê qirêjî bê qeyde dimeşîne. Bi komplo, entriqa, şantaj û listikan şer didomîne. Lê "li ser Kurdistanê re sefer dibê, lê zafer qet çênabe." Çimkî ne kurd kurdê berê ne, ne jî serok-serokê eşîran e. Tevgera Azadiyê bi bîrdîza sosyalîzma zanîstî, çîna proleter û piştgirîya gundiye kedkar û hemû tebeqeyên gel eniyek neteweyî ava kiriye. Wexta destpêkirina têkoşîna dost û dijmin tu kesî bawer nedikir. Îro artêşa gel, parlamentoya neteweyî, enf û aboriya neteweyî û hwd. ji bo dewletbûnê hemû sazî û dezgeh hatine avakirin. Dîsa jî hêla çandî, çapemenî, zîman, huner, wêje, mûzikê ve jî xebat û çalakiyên girîng berhemên şoreşê çêdibin. Îmkân û derfetên dîrokî ketine destê me, lazîm e em peywira xwe bi baldarî pêk bînin û welatekî azad û serbixwe ava bikin. Çimkî ev şansê dawî ye û lewre jî şert e ku her kes li gorî quweta

xwe rîsta xwe bileyize.

Seferberî! Ji bo xelasbûnê, ji bo serfiraziyê û ji bo gihîştina armancê ye. Divê em bi mal, can, hemû îmkân û derfet, dil û rih, raman û hest û hwd. bi doza xwe re bin û piştewaniya hêzên artêşa xwe bikin. Divê her tiştê me ji bo xurtkirina artêşa gel be, dîsa gelê me yî derveyî welat dev ji koçberiyê berde û vegere welat.

Bawerîya me gerek xurt be, ew eş û jana tê kişandin ewê bibe hevîrê xweşîya serxwebûn û azadiyê. Pêwîst e her tiştê me; xwarin, vexwarin, xebata me, xeberdana me, bi kurtasî jiyana neteweyî di bin fermana şer de be.

Ençam! Dijminê mijokdar, xwînwar, minafiq dîsa dixwaze me tune bike. Ji bo ku ev xwestek di qirika wî de bimîne û negihêje armanca xwe, tiştê girîng; divê em talimat û fermanên partiyê pêk bînin. Şehîdên me, bawerîya me heviya me û rîya me bi xwîna xwe ronî kirin. Girêdana rast û durîst tevle-bûna seferberiyê ye. Her kurd lazîm e wek Zîlanan bibe bombe û bi serê dijminê bav û kalan de biteqe.



PIŞTÎ sekinandina kar û xebatên xwe yên du salan, Navenda Çanda Mezopotamya Şaxa Amedê bi çêşeke mezin vebû. Li gorî bernameya vekirina NÇM'ê, rêveberên NÇM'ê ji bo roja 13'ê rezberê "Tesisên Demirok" kirê kiribûn, lê rayedarên dewletê destûr nedan şahiyê berfireh lewre jî, şahî bi beşadariya 500 kesî li avahiya NÇM'ê hate pirozkirin. Ji NÇM'a Stenbolê "Koma Amed", ji NÇM'a Mêrsînê "Koma Zilan", ji NÇM'a İzmirê "Şanoya Hêvî" û Koma Xortên Amed, di pirozbahiyê de derketin hemberî gel. Wekî tê zanîn hêzên dewletê di sala 1995'an de avêtibûn ser NÇM'ê û gelek endamên saziyê xistibûn binçav, piştî vê êrişê xebatên NÇM'ê li Amedê rawestiyabûn.



Di rojên derbasbûyî de 62 kesên başûrî ji bo ku derbasî Yewnanîstanê bibin, li herêma Dedeagaça Edirneyê pê li mayinan kirin û bi teqîna mayinan 3 kes mirin 25 kes jî birîndar bûn. Der barê vê yekê de rayedarên yewnanî, tirkan berpîrs û sûcdar dibînin. Wezîrê Parastîne yê Yewnanîstanê Akîs Cohacopûlus daxuyand ku Tirkîye ji bo ku cihên mayina kişî bike, kurdên başûrî bi kar tîne. Ji bajarê Orîstîda Midûrê polîsan Nikolaos Zapatiadis jî got ku şebekeyên ku serê mirovekî 1000 \$ pere distînin bi şirkatiya rayedarên Tirk vî karî dikin. Her wiha Heyva Sor a Kurdistanê li Yewnanîstanê, ji bo raya giştî ya cihanê daxuyaniyê çapemeniyê belav kir û Tirkîye şermezar kir.

NÛÇE

Bêyî PKK'ê xeta neftê nayê danîn

Guhastina nefta Behra Hazarê yek ji mezintirîn projeyên cihanê ye. Dewleta tirk ji bo pêkhatina Xeta Bakû-Ceyhanê ku ji alternatîfan yek e, têdikoşe û di vî warî de bi dewletên wekî Rûsya û Îranê re di berebaziyê de ye. Lê kesên ku vê projeyê fînanse dikin jî di nav de, her kes ji bo pêkhatina vê alternatîfê, çareseriyê kêşeya kurd pêwîst dibînin.

Di salên dawîn de Partiya Karkerên Kurdistan her diçe bêhtir dibe xwedî hêz û desthilatdariyê. Di bihêzbûna PKK'ê de cihê guhastina nefta (petrol) Behra Hazarê de jî gelekî girîng e. Derxistin û guhastina petrolên Behra Hazarê di nav mezintirîn projeyên cihanê de tê hejmartin. Dewleta tirk têdikoşe berpîrsên vî karî qanî bike da ku ji vê neftê beşek bi riya boriyan di nav Kurdistanê re derbas bibe û bigihêje Behra Spî. Tê ragihandin ku wê di sala 2010' de di salê de sed mîlyon ton neft bê hilberandin. Li gorî hinek pisporan heke nefta Hazar biherike bazara cihanê, wê erzan bibe, lewre jî wê girîngiya nefta Rojhilata Navîn kêm bibe.

Wekî tê zanîn desthilatdarên dewleta tirk ji bo ku daxwaza xwe bi desthilatdarên Kazaxîstan û Azerbeycanê bide pejirandin, digel komek rojnameger û karsazan derketibûn seferê jî bo Asyaya Navîn. Hikûmet û çapemeniya tirk Xeta Bakû-Ceyhanê wekî "mezintirîn projeya di dîroka Tirkîyeyê de" bi nav kirin û ragihandin ku wê ev proje "bextê reş" ê dewleta tirk biguherîne. Ji ber vê yekê Serokwezîr Mesut Yılmaz di yekemîn serdana xwe ya derve de, çû Kazaxîstanê. Piştî serdanê çapemenî û rayedarên tirk diyar kirin ku Azerbeycan û Kazaxîstan piştigiriyê Xeta Bakû-Ceyhanê dikin û ev serdan wekî "serketin" bi nav kirin. Wekî tê zanîn heman nîrxandin di sala 1995'an de di dema serokwezîriya Tansu Çillerê de hatibûn kirin, lê piştî re encameke erênî derketibû. Jixwe biryara dawîn ne ya dewletan e, şirketên ku neftê derdixin xwediyê gotina dawîn in. Dîplomaten ewrûpî vê helwesta hikûmeta tirk wiha şîrove dikin:



Dewleta tirk ji Ewropayê dûr dikeve, lewre berê xwe dide Asyaya Navîn.

Li aliyê din Rusya jî bo ku teza xwe bide pejirandin îsrar dike. Mesut Yılmaz ev yek li xwe danî û daxuyand ku, bêyî lihevkerina bi rûsan re ev proje pêk nayê. Her wiha nivîskarê rojnameya Sabahê Hasan Cemal roja 6'ê rezberê di quncikê xwe de dîtînen dîplomatekî rûsî ragihandin. Bi pey daxuyandina Cemal, diplomatê rûsî wekî astengên li ber Xeta Bakû-Ceyhanê şerê li Kurdistanê jî destnîşan dike. Dîsa heman dîplomatekî dide zanîn ku guhastina neftê di nav Tengava (boğaz) Stenbolê de gengaz e. Tirkîye bi nepejirandina vê yekê Peymana Montreux bînpê dike. Ev yek wê li Behra Reş bi sedema rûdanên erjeng. Dîsa Mehmet Alî Bîrand jî roja 10'ê rezberê diyar kir ku hîna li holê tiştêkî berbiçav nîn e û xwest ku kes xwe nexapîne.

Hêviya Çillerê Tamraz, sextekar derket

Li ser vê mijarê endamê PKDW'ê Ahmet Aktaş, bal kişand ser nebûna peymanekê fermî û daxuyand ku Tirkîye di vî warî de giranî daye propagandayê û hêviya xwe bi tirkperestiyê ve girêdaye. Lê di sistema kapitalîzmê de tiştê girîng berjewendî ne. Aktaş ev gotin li axaftina xwe zêde kirin: "Şansê dewleta tirk di vî warî de pir kêm e. Heta baştirîn dostê Tirkîyeyê DYA jî li cem Tirkîyeyê cih nagire. Dewletên wekî Ermenîstan, Îran, Iraq, Sûriye, Yewnanîstan û Kîbrîsê jî nerazîbûna xwe ragihandin." Dîsa der barê vê yekê de berpîrsê AKIN'ê Kanî Xulam, ku helwesta DYA'yê jî nêzik ve dişopîne, ragihand ku, di vî warî de desthilatdarên tirk di nav xewn û xeyalan de ne û got ku, pêkhatina vê projeyê jî girêdayî aştiyê ye. Kesên ku dixwazin vê xetê ava bikin vê yekê jî Tirkîyeyê baştir dizanin û piştigiriyê vê projeyê nakin. Berpîrsê Tora Agahiyan a Kurdên Amerîkayê (AKIN) Xulam axaftina xwe wiha berdawam kir: "Li aliyê din, çaresernebûna pîrgîrêkên di navbera Ermenîstan û Azerbeycanê de jî pêşiya vê projeyê digirin. Di vî warî de tu gav nehatine avêtin. Divê ev problem bê safîkirin."



Divê gelê êzdî li dozê xwedî derkeve

Îro bi xêra serokê neteweyî û niştimanî, di jiyana xwe de min xwe kurdekî êzdî dizanî, lê serok evîna gelên Kurdistanê û cîhanê kir dilê min, bo mamosteyê hemû olên li Kurdistanê, li ber her olekê rêça lêkolîn û lêgerînê vekir. Erê, ji min mirovekî bi ceger û zana peyda kir.

Ger şêxê te be yan pîrê te be li ser şora xwe ewil be, ger wî dest ji te berdan tu destan jê bernede. Ger şêxê te be yan pîrê te be ne li ser şora xwe ewil be, ger wî dest ji te bernedan, tu desta jê berde. (Qewlê Melek Fexredîn.)

Bi vî awayî mirov kane pir rêçan ji hev derfîne û vê gotina pîroz li ser baweriyê pakkî şrove bike. Şêx yan pîr wateya serokekî dide, wateya mirovekî jêhatî û jîr ku kanibe gelê xwe biparêze û li gorî çerxa dinyayê bi pêş ve bibe, cihekî jê re li nav gelê cîhanê peyda bike.

Di demekê de ku bi tenê gotina Xwedê di nav gelan de cih girtibû, mirovê zana û jîr bi navê Xwedê, ewliya yan pêxemberan gel komî serhev dikirin û ji hêrişên biyaniyan diparastin. Bi vê rêçê merdemên cîhanê kultur, xûy û karakterê xwe parastin û navekî xwe di mêjûyê cîhanê de bingeh kirin. Êzdiyên me bi serfirazî li ber xwe dan û li dijî gelek xwînxwaran sekinîn, xwe parastin û ev rewşa wilo dirêj bû ta roja îro.

Gelê me tim doza mafê xwe kiriye

Niha em bala xwe didin rewşa dinyayê, em dibînin ku miletê li şûnmayî, bê welat û ax, kurd in û gelê Kurdistanê ye. Jixwe sedemên vê li paşmayîne heye, girîng e em li ser vê xalê bisekinin û vê wêranîyê çareser bikin. Di Kurdistanê de mirovên bi rûmet pir bûn, kolefî û dagirkerî nexwestin, her gav li ber xwe didan, wekî lehengên Abdul Rehman li dijî tirkan sala 1856, Bedirxanan salên 1842-1846, Ûbeydulahê Nehrî sala 1830, Yezdan Şêr salên 1853-1855, Şêx Seidê Neqşibendî



Bi geşbûna têkoşîna neteweyî, kurdan ji baweriyên cuda, destê xwe dan hev, nexweşî û dubendiyên berê ji navê radibin. Bi taybetî gelê me vî êzdî ku bi salan zilm û zordarî dîtibû, niha li nik xwe, birayên xwe yên ji baweriyên cur bi cur dibîne.

1925'an û êla Berzan di navbera salên 1962-1975'an de serî hildan. Van lehengên kurd, ne li ser dîtineke zanistî serî hildan, na; van wekî malên Bedirxanan, Talaban û Berzanan, yaxûd ewliyayên olî wekî Neqşibendiyan û Qadiriyan, rêçên xwe ji bo xurtkirina gelên serdest li welatê xwe xebat dikirin, bi tunekî dizî yan îndîrekt, wan dizanîn ku ev kar ji bo pakîya dinyayê ye û serbilindîya hebûna însan e, wan tu caran nedixwestin ku însanên herêmê bi şûr û mertalan li hev bidin. Nimûneyek biçûk di dîroka Kurdistanê de:

Gava ku Mîr Selehatîne Eyubî her sê lehengên ewrûpî; Richard, Fîlîpe û Friedrich Patşêhê Almanya, dîl kirin û ji wan re got: "Çima hûn hatin welatê me, ev welat ne welatê we ye, de fermo vergerin û devê xwe bidin welatê xwe."

Wilo gelek ji mirovên kurd ên mezîni di vê gotinê nefikirîn û ji xwe pirs nekirin: Gelo! çima Sultanê kurd wisa ji wan re got, çima em ji ji dagirkerên tat, faris û turan re wisa nabêjin, bêhes, bê deng dimînin û xwe erzan difiroşin dijmin. Îro civata însan di hemû warî de hatiye guhartin, girîng e em zanibin û em çav-vekirî bin, çawa De Gaule Fransa azad kir, çawa Mao Çe Tung, Gandî, Tîto, Ho şî Mînh, Lenîn, Stalîn, Fidel Kastro, Botrus Lomumba û Martîn Luther Kîng ji bo azadiya gelê xwe xebat kirin û gelê xwe ji bin zordariyê derxistin, lewre hinek rewşenbîrên dilpak bi wan re rêça serxwebûnê bi pênûsên xwe ronî kirin, wisa jî niha serokê neteweya kurd bi rengê mirovên jîr û serbixwe hatiye holê, bi baweriyê-

ke ciwan, bi bîreke zanistî, bi dilpakîyeke niştimanî û bi şorkariyê rast dirust meşa serxwebûnê berdewam dike.

Mirovên ku welatên xwe azad kirîne, rewşa wan ne wekî rewşa serokê kurdan bû, ji ber ku dijminê wan î resmî (yek) hebû. Gel, gişt li pişt wan bû, alîkariya wan dikirin, ger mirov şoreşên welatê rojhilat bixwîne wê rind agahdar bibe, lê ev leheng wekî Rustem û Kerîm Zend, şerê dinyayê dike, çar dijminên hov, gelek ceşokên kurd û serokên nezan û xwefiroş û bi ser her tiştî de gelê şûndemayî. Ev gişt bûye telam û bar li ser milê vî camêrî, de êdî çawa tuyê xebata vî mirovî înkâr biki, çawa tuyê guh bidî dijminê xwînxvewar û li dijî gelê xwe çekan rakî.

xewna gelên bindest pêk tê

Niha ji hemû gelên cîhanê re hatiye xuyakirin û bi taybetî ji hemû ronakbîr û rewşenbîrên kurd û cîhanê re ku serokê kurdan mirovekî xwediyê dadmendiyê ye, xwediyê serxwebûn û azadiya gelan e, ne tenê gelê kurd, lê belê gelê ermenî ku çend caran deriyê serxwebûnê jê re vebûye lê dijmin derî girtiye û gelê şareza di şevreşîya bindestiyê de hiştiye, dîsa mirov kare ji her mirovekî ku li Rojhilata Navîn dijî pirs bike. Ma gelo wî dizanibû asûrî, çerkes, alewî, êzdî, sunnî û her çar mezhebên îslamê cihê jiyana wan çawa ye.

Îro bi xêra serokê neteweyî û niştimanî, binaxiya xebata wî û şangirtiyên wî rewşenbîrên welatparêzin. Kurdistanê ku milên xwe dane milê vî mirovê

jêhatî ku bêhna azadbûna gelan ji şor û xebata wî tê. Di jiyana xwe de min xwe kurdekî êzdî dizanî, lê serok evîna gelên Kurdistanê û cîhanê kir dilê min, bo mamosteyê hemû olên li Kurdistanê, li ber her olekê rêça lêkolîn û lêgerînê vekir. Erê, ji min mirovekî bi ceger û zana peyda kir.

Tu caran nedihat bîra yekî êzdî ku di stûdyoya televîzyonekê de rûne, qewlî û beytên firiştên (melaîkên) êzdiyan bêxof û saw rêz bike, Tac û Hilên êzdiyan di televîzyonê de xuya bike û cejna çarşema sersala êzdiyan bi hemû muslimanên kurd re pîroz bike. Ma ev ne xewn e ji gelê êzdiyan re, çima zanayên êzdiyan xwe nakin yek û destê xwe nakin welatê xwe û ji bo niştimanê xwe bi kar naynin, ji ev çî hale em tê de ne, şêx, pîr û mirîdên me ji hev direvin û xwe pergale dikin, gelê êzdiyan tê belavkirin, ma ji bo çî em wilo şaş û bêhal mane, ev ne şerm e ji me re ku em devê xwe tijî dikin û dibêjin em lawê Kawa, Zerdest û Rustem in.

Na bi Xweda û Tawûsî Melek na, bi her heft siwarên mala Adiyân, nabe ev kar, ev rûniştina, li civata êzdiyên şerqî û Şamê nayê; Ji her mirovekî êzdî re erk e ku alîkariya vê meşê bike ji bo xatirê hemû şehîdên Kurdistanê, ji bo xatirê mirovên biyanî ku ji bo serxwebûna Kurdistanê bi hezaran km. dane pişt xwe û zordariyên li ser gelê Kurdistanê protesto dikin.

COTKAR

Di kurdî de 'kur'

Dema mirov bi awayeke şerût jî lê bikole, mirov digihêje vê etîmolojiyê ku mêr ji mirinê tê. Ji ber ku bela û mirin jî parêzkar, şerûd û şervaniya mêr tê û mêr bi xwe, bi xwezahî xwediyê van xisletan e û "jin" jî, ji jiyane tê.

Di kurdî de wateyên peyva "Kur" gelek in, lê ya balkêş, "kur" di baweriya pîrikan de "Bêoxir" e. Di civaka kurdan de ji kesên ku di rûyê wan de bûyerek (bi taybetî pevçûn û şer) derdikeve re dibêjin 'Kur e!'. Lê ev peyv wate bi piranî ji bo keçan tê bikaranîn.

Mînak; dema keçeke biçûk di jiyana û xebata xwe de çewtiyan dike, diya wê bi her du destên xwe li serên wê dixê û dibêje: Ufff! Kur ê!. Tu kur î! Kengî hebe dê mala me bi destê te xerab bibe!.

Zarokên ku sûc dikin, di navbera malbat û cînan de bûyeran derdixin; wek şer, mêr kuştin, malbata zarok wî nalet dike. Dema ku ji ber xwîniyê koçber dibin, li zarok xwedî demakevin û dibêjin: Tu kur î, bi me re neyê! û wê zarokê di nav malbat, cînar û civatê de nalet dikin.

Ev jî dide xuyakirin ku, kurd tim jî belayê reviyane, koçber bûne û bi awayekî perwerdeyî be jî, ji bo ku jiyana wan xerab dibe, nalet li zaroka/ê xwe dikin ku nekeve nav van çewtiyan û belayeke wiha demexe.

Hevokên ji bo van zarokên nehês ên ku serê malbata xwe dixin belayê wiha tê gotin: "Kurîfî jê dibare!", "Kur e bêyom e!", "Kur e dê serê me bixwe!", "Kur e dê serê me bixwe!", "Kurîfî ketiye çavê

wî!", "Kur e xwe jê dûr bike!", "Kurîtiya te xwedê me jê dûr bigire!", "Ev kurîfî ji te re namîne, dê serê te bixwe!", "Kurîtiya te dê serê te bixwe belayeke mezin!", "Ji vê kurîtiya te dê gelek bela were serê te ku tu nizanîbî ji ku ve hat..."

Bi qasî ku dirokzan didin zanîn, wateya "Kur" di destana Gilgamêş a navdar de, yek, "dijmin" dido, "mirin" e. Dema mirov li kiriyara zarok jî dinêre encam dijminatî û mirinê derdixe holê. Li vir jî xuya dibe ji ber ku kurdan jî, 'dijminatî û mirinê' hez nekirine, yê ku ji bûyera ku belayê li serê mirovan derdixe nalet kirine û dikin û di kurdî de ev peyva "kur" wateya dijmin û mirinê kirine. Wekî din jî di kurdî de peyva 'kur' bi wateya xwe 'law' e, ji ber ku law (mêr) tim parêzkar, şerûd û şervan e; tim jî wan bela, mirin û dijminatî peyda bûye. Li gorî etîmolojiya gelêrî dibe ku ev nav li kurê (law) jî hatibe kirin û dema mirov bi awayeke şerût jî lê bikole, mirov digihêje vê etîmolojiyê ku mêr ji mirinê tê. Ji ber ku çawa me li jorê jî rave kir bela û mirin jî parêzkar, şerûd û şervaniya mêr tê û mêr bi xwe, bi xwezahî xwediyê van xisletan e û "jin" jî, ji jiyane tê. A rastî jiyana (jin) jî jinê tê. Zîn, şîn, hêşîn û jin hebûniyên zêdehî û berhemê ne.

Bêyî ku em ji babeta xwe derbikevin, me li jorê dabû xuyakirin ku wateyên peyva "Kur" di zimanê kurdî de gelek in. Em li wateyên wê mêze bikin.

Mînak:

Kur: bêyom, bela

Kur: Law

Kur: ji ku re

Kur: ava kur

Kur: kor

Kur: kur û giriya

Kur: kur gazî (bang li) çîçikan dikin

Kur: ser

Ev heşt wate her çendî sê libên wan herêmî û devokî bin jî, pênc ên din wekî hev tene nivîsandin wateya wan cuda ne û di bilêvkirinê de jî hinek kurt, hinek dirêjtir, hinek hişk û hinek jî nemitir in. Em mijara fonolojiya ziman li vir digirin û vedigerin ser babeta xwe.

Ji tiştên ku heta niha hatin gotin û ji diyardeyên etîmolojîk û bi şahidiya destana Gilgamêş diyar bû ku peyva "kur" bi wateya dijmin û mirin e, îro jî, bi mecazî van wateyan diparêze û wekî din jî, ev diyar dibe ku zimanê Gilgamêş, her çiqas mirov nikare bi peyvekê îspat bike jî, bi xurtî têkildarî kurdiya îro ye.

S. S. DILPOLO

Gelo Rewşenbîr kî ne?

CELALETTİN YÖYLER



Ez dixwazim di vê nivîsa xwe de, li ser hin peyv û bêjeyan rawestim û bi hûrnêrinê zanistî û wan felsefî peyvên wekî rewşenbîr ronakbîr û şoreşgeriyê binirxînim.

Gelo rewşenbîr kî ne rewşenbîr? Ew kesên ku ji zanîn û dîtînan wan ên mirovahî û hemdemî tîrêjên rewnaq û ronahiya xwenasîne didine komel û civakên hawirdorên xwe. Ji dîtînan û ramanên wan, ji bona pêşvebirina doza mirovahiyê di her cih û her demê de xêrxwazî û qencî tê.

Dema ku em wiha li wateya peyvê binêrin, wê gavê em nikarin ji her kesî re bibêjin rewşenbîr. Mirov dikare bersiva pirsê wiha jî bide: Rewşenbîr ne ew in ku ji cur bi curên zanînan xwendine û navên wan profesor, doçent an dirokzan û civaknas in. Belkî em, ji xwediyên van beşên zanistî re dikaribin bibêjin rewşenbîr, heke wan xwe gihandibe radeya wateya peyva rewşenbîriyê. Lê heger wan kesan xwe negihandibin wê radeyê, wê demê ew ne rewşenbîr in.

Wekî niha endazyar "Silo paşa" dema ku ji hêla Serokatiya Partiya Demokrasiya Gel ve pirsgirêka gelê kurd, jê tê pirsîn, dibêje: "Tu

pirsgirêka kurd tune ye. Lê bi tenê pirsgirêka terorê heye." Dema ku em bibêjin her kesê xwendî rewşenbîr e, wê çaxê divê ku em bi hezaran ên wekî "Çoban Silo" rewşenbîr bihesibînin. Hem jî, divê ku em, dîtînan û ramanên nijadperestên çepel ên ku ji mirovahiyê dûr in, ji ber ku ji devê kesên xwendî derketine, wekî dîtînan û ramanên rewşenbîrî bi nav bikin. Na ev yek, ne ramanê zanistî, civaknasî û felsefî ye; lewre divê ku, ji her kesê xwende re, em nebêjin rewşenbîr.

Kesên ku dîtînan û zanînan xwe yê felsefî, civakî û mirovahî bi awayekî objektîfî jibo ronîkirina riya komeleyan û kesan dixebitînin, ew kes rewşenbîr û ronakbîr in. Lê pir mixabin bi dehan kesên ku xwe rêber û rêzanên gelê kurd dane diyarkirin û nişandayîn; hê jî ne rewşenbîr in. Ew kesên bi vî rengî, her dem doza gelperwerfî û welatparêziyê, li ser navê rewşenbîriyê, ji bo berjewendiyên xwe yê kesayetiye bi kar anîne. Pir fedî û şerm e ji bo wan kesên me yê ku dîsa dibêjin em rewşenbîrên gelê kurd in, lê ji destpêka şerê çekdarî hetanî vê demê, hê jî, ji ezîfî û xudbîniyên xwe yê, kevneperestî berjêr nebûne. Ew hê jî nabêjin ku ji bilî "têkoşîna çekdarî" tu rê jî gelê kurd re nemabû.

Mînaka herî mezin ji bo van birayên me yê ku dibêjin em siyasetvan û şoreşvan ên kurd in û her tim di cihên xwe de radiwestin û dibêjin "pêwistî bi şerê çekdarî tune ye", helwest û mebesta xerab ya "Silo Paşa" ye. Gelo ev kesên me yê ku dibêjin em rewşen-

bîrên gel in, vê helwestê nabînin ku ji bilî tevkujiya kurd, tu tişt di helwesta wî de nayê xuyakirin.

Gelî birayên ku hûn xwe di radeya berpirsiya gelê kurd ên reben de dibînin, pir bibexşînin; divê ku em di "afirên keran de ranezên" û xewnên pêxemberan nebînin."

Lewre dewletên ku em ketine bin destên wan, ne Înglistan e ku em jî bibin "Gandhî û Nehro", ew ne firsansîz in ku em bibin "Ehmed Bîn Bella" ku wekî Cezayîr û Hindistanê bi çalakî û serhildanên demokrat xwe û doza xwe bidin pejiwandin. Ew kesê ku dibêje, ez rewşenbîr im, divê ronahiye bide doza gelê xwe û hawirdora xwe, hem jî divê şoreşgeriya li ser qada welat, binirxîne û destê xwe bide ser wijdanê xwe û serê xwe, ji wê şoreşa çekdarî ya hemdem re bitewîne.

Gelî kesên ku hûn ji xwe re dibêjin em rewşenbîr in; me li jorê nixandineke zanistî daye diyarkirin, hûn li ber şehîna wê nixandîne, kiryarên xwe yê berevajî, deynin ser mêzîne û bikêşînin. Heger ew kêşandin bi awayê nixên rewşenbîriyê derket, jixwe rewşenbîriya we rast û dirust e. Lê heger derneket, tikaya min ji we ew e ku hûn defterên kiryarên xwe, di ber çavên xwe re derbas bikin û ji serhişkî û ezîtiyê dûr bikevin û birevin.

Lewre gelê kurd ên belangaz ku bi sedan salan e hatiye perçiqandin, talankirin û zêrandin êdî hişyar û zana ye, kiryarên her kesî jî, bi awayê tevgerên wan dinirxîne.

Vebûneke Bihuşti

Di nav çem û kaniyên avê de tîbûn; di welatê rojê de ku ji her alî ve dewlemend e birçibûn; di welatê agir de jiyaneke agir tefiyayî û di aqareke pêncsed hezar kîlometre çargoşe de; hemû deşt, zozan, çiya û newal ji axê dûr dijîn. Di welatê agir û rojê de ji kulîlkên, biharê bêhna jehrê dihat. Ji av vexwarinê mirin, ji derketana serê çiya bêbawerî û xof. Ji axê hilmên germ li ser rûyên mirovan diket. Mirov gêj û bê taqet dikir.

Ax bi hesreta avê, tov ji bo rengê xwe veke bi hesreta tîrêjên tavê; av li hemberî perdeyên tariyê bêçare mabû. Hewa bêaram; her dem bi toz û telaz, her dem dibû bager û bahoz, bi ser tova jiyane de diherikî. Lê mirovên wê!

Mirovên wê ne mîna reşikên Afrîkayê hestî û eyar mabûn, ne mîna kesên Ewropa zanebûn! Ne mîna welatparêzê Viyetnamê bi bîr, bawerî û bi dîroka xwe ve girêdayî bûn, ne mîna kesên Erebaştanê ji beriya Hz. Muhamed hov bûn û ne ji mîna gelê Rûsya xwedî serok, bîrdozî, konevanî û hêz bûn. Jibona wan, êş û birîna wan ne wekî ya tu kesî bû. Dijminê bavan ew anîbûn rewşa qewmên Lût Pêxember. Her yek di xefletê de, her yek tewanbar, bêgîyan, bêhêvî û bêraman...

Belê Amed! Amed bédeng!

Amed bêronî! Amed bêaram û bi qêrîn û hawar bû! "Her tişt bi xayintî, her tişt li rastiya xwe reş reş dinihêre. Ji her tiştî bêhna bêhêvîtiyê tê." (Serokatî)

Tariyê, çavê girtiyan kor dikir. Dengê dar û xêzîranan, dengê leşkerên çavsorguhê wan ker dikir. Lêdana şev û roj bejna wan lewaz dikir. Qolincê piştê tev sorî-morî dikirin. Ev der ne Saygon û ne jî kampên Hitler bû, dilê Mezopotamyayê; dergûşa efsaneyî mirovahiyê bû.

Vejiyandina şeva Medî

Hinek ji wan wekî kewan ketin defikê û dest bi qebe qebê kirin û hinek jî mîna pîreka Lût pêxember di gava yekemîn de li paş xwe zivîrîn û di cihê xwe de bûn kevir. Hinek jî mîna Gilgamêş ji bo hevalê xwe, gelê xwe û ji bo mirovatiyê ber bi jiyaneke bê dawî ve gava xwe avêtin.

Yekî, di şeveke Medî de dîroka bav

û kalan vejiyand. Bi qutkirina hilma xwe û dayîna wê ji tova zerikbûyî re. Bi hilma xwe gemar ji ser axê rakir û piştî 2594 salan şeva Medî bi canê xwe yê şîrîn ronî kir.

Çaran jî mîna Brûno, bi şewitandina laşên xwe razîbûn, lê bi dûrketina ji ramanên xwe ne razî bûn. Wan jî bi agirê bedena xwe ew cemedî ku roj bi roj qewimî dibû helandin. Axa sar bi parçeyên laşê xwe germ kirin. Êdî xwelî hem paqij hem jî germ bûbû.

Dibêjin; zindî ji xweliyê, agir, av û hewayê çêbûne. Ji bo afirandina mirovê nû di civakê de jî hemî merc amadebûn, ji bilî avê. Av pêwist bû.

Xwelî bi hawar bû, bi qîrîn bû û di nava xwe de ji tîbûnê diterikî. Ji qehra libên wê ji hev bi dûr ketibûn. Xweliyê û tovê bi hev re jiyaneke birûmet borandin, lê niha ji hev cihê bûn û wan mîna biyanan li hev mêze dikir. Xweliyê ji zû de stêrk li ezmanê xwe nedîtibû. Stêrk bi xemla xwe nedîçurisîn û ronahiya wan bela-wela bûbû.

Xakê av divê, lê wê kî karibe bibe baran?

Belê, xwelî hêvîdarê avê bû. Ava herî paqij bes di layê mirovên leheng da mabû. Her wekî serokatî jî diyar dike "... Ne hêsan bû ku mirov bibûna ewr û baran bibarandana ser rûyê erdê. Mirov dikare bibêje, ji bo vê yekê diviyabû bi şiyaneke mûcîzewî û pêxemberî rabûna ser piyan." Lewra biryar, bawerî û vîna karkerekî di karxanê de naskirina fîlozofekî, di guharînen xwezayê de cesareta şerekî, di êrişê de zanebûna zanyarekî, di peyketinê de biryara mirovatiyê û jiyaneke serbixwe û azad dixwest. Çar lehengên piştî pêncan, di kesaniya xwe de ev napezana civandibûn û didan jiyandin. Ji şikefta Ehliilkehef zîndana Amedê ev yek bi dil û mêjiyê xwe dîtibûn.

Êdî roj, roja biryarê bû. Roja 14'ê tîrmehê bû. Roj hatibû ku her çar lehengan biryar dan ku ava laşê xwe zuha bikin û xweliyê av bidin.

Roj, roja dijmin bû! Roja xurtkirina kurmê darê bû

Roj, roja ku wan her çar mîrxasan ji bedena xwe dilop dilop av di ser xweliyê de berdidan. Roj, roja dawî ji

qêrîna axê ra anîn bû.

Belê, wê rojê şadîmaniya çavên wan mîna şadîmaniya di çavên Nûh pêxember de ku dema gihîşt serê Çiyayê Cûdî, diçurisîn û di kortikên xwe de dilîstin. Rawestîna wan a bihebet mîna ya Bilalê Hebeşî bû; çawa ku wî li hemberî kevirên kafiran azana xwe berdewan kir, lehengan jî wisa di bin lêdanê de ramanên xwe diparastin.

Roj, roja sebrê bû. Mîna sebra Hz. Eyûb; ew sebra ku ji bo girêdana xwe ji Xwedê re îspat bikira, bi salan ket doşeka mirinê, dev ji mal û zewqa dinyayê berdabû: Di dawiyê de gihîştibû armanca xwe.

Xweliya welat ji başûr heta bakur, ji rojhilat heta rojava di wê rojê de bi lebat bûbû û di nav xwe de hinekî cesaret girtibû. Tava zer ji nav qelişînên axê de dengê avê, bihîst, lê av pir hêdî diherikî û bédeng bû.

Êdî xwelî li bêjîngê diket

Ji dûr ve jî xebat dihat kirin ku cihuyên avê vekin û tovê bidin jiyankirin. Lebat tev ji bo gihandina hev du ya avê û xweliyê; afirandina mirovên nû di civakê de û jiyana nû bû. Li der hinekan bi xwêdana eniya xwe av di cihê de xurt dikirin, hinekan jî li hundir xwîn bi ser avê de çilpik çilpik berdidan. Hem li der, hem bo strandina hevîrekî paqij û pîroz. Lewra êdî ked di riya rast de dihate xerckirin.

Êdî xwelî li bêjîngê diket. Strandina hevîrê jiyana nû û mirovê nû dest pê kiribû. Her roj bi cengawerî, bi kedeke pîroz, serkeftin û cesaret dihat bihurandin Lewre serkeftin zarokê cesaretê ye. Kesên xwelî li bêjîngê didan serdestê vîna xwe, bindestê wijdanê xwe bûn.

Belê berxwedana li hemberî her tiştî dihat kirin. Çiqas laş lewaz, ronîya çavên wan kêr, rihê wan dirêj û ava di canê wan de kêr dibû, ew qas jî hêza avê ji bo gihîştina xweliyê zêde dibû. Belê lewazbûna laşê wan, xurtbûna ramanên wan bû. Yanê ronahîkirina şikeftê û ji welatê xwe didan ronîkirin. Rojên xwe bi bîranîn û helbestan derbas dikirin;

"Dinyaya zor ciwan e, şîrîn e
Em têda hêstîr in, welat nîn e

Gelî mino tu zor ciwan î

Hem merd û hem qehreman î

Ka ew sozê te yê ciwanî"

Di pêşiyê de hevîr bi aveke enter-nasyonâl hate histran. Wê avê rihê rêxistina ala sor bi rengêkî pir zelal û bi mirovatî mora xwe lê da. Ew av, ava bedena Kemal Pir bû. Piştî zanebûneke dîrokî û rêxistî hate qulupandin. Lewre hevalê Xeyrî bi ku ve diçû ew der li gorî xwe diquluband. Cara sêyemîn bi avekê mîna ava zemzemê ya hevalê Akîf strandin berdewam bû. Heta lehengê nemir hevalê Alî bahozê şoreşê sitêrka sor, tova li serê çiya da avdan. Wan lome ji zehmetiya sitrandina hevîr nedikirin. Lewre ew bi dilê xwe ketibûn nava vî karî. Ew mirovên xurt bûn. "Mirovê bi qewet, yê bi xwe dikare ye." (Hz. Muhamed)

Axa herî pîroz, ew e ku bi xwîna mirovan hatibe histran û tê de kulîlkên bihuştî hatine çandin.

Av xweşik diherikî êdîq

Ji wê rojê ve hevîrê ku ji av, xwîn û xwêdana nivîskarên dîroka nû dest pê kiribû, êdî av bi rehetî ji cihuyên neyaran derket û kete cihê ya azadiyê. Bi taybetî jî dema rêveşopên wê bi çek li ber notirvanî girtin, xweş herikî. Bê ku tu avbendiyekê nas bike. Bê ku tu vampîr bikaribin, devê xwe têxin cihuya azadiyê. Bê ku gel ji rijandina xwînê, xwêdanê û ziwakirina ava bedena xwe bitirsîn. Êdî ku çavên xwe ji tîrêjên tavê bişkînin. Bi serbilindî li xweliya xwe xwedî derketin.

Lê pêwist e neyê jibîrkirin ku; parêzvanê wan ê herî jêhatî, mirovê mezin bi xwe ye. Lewre wî ax dît, tov bi cih kir û senteza riya avê da çêkirin û da nasîn. Ji wê rojê vîr de hilma mirovan vebû, nexweşî derman bû û ava çemên welat bi xume xumî herikî. Avbendên ku neyar dabû çêkirin hatin hilweşandin. Dara azadiyê bi ser mirovê nû de siya xwe bilind kir û li hemû welat û rojhilat da firehkirin û belavkirin. Kulîlkên ku bi ava wan egîtan şîr bûn bi rengê kesk, sor, zer û spî li ser çiyayekî, newalekê, deştê û zozanekê vebûn. Vêbûneke bihuştî.

AHMET HUSEYÎN



- 20.09.1992 - Zanyar, Ebûqat, dîrokzan, rewşenbîr û rojnameger... û nivîskarê rojnameyên welat, Yenî Ülke, Özgür Gündemê Musa Anter, li Amedê ji hêla qontr-gerîla ve hate qetilkirin.
- 20.09.1985- Ruhî Su çû ser dilovaniya xwe.
- 20.09.1980-Şerê Îran û Iraqê dest pê kir.
- 22.09.1996- Mîhrîcana Kurdistanê ya Navneteweyî ya Çaremîn, li ser navê Zeynep Kinacı (Zîlan) li Ewropayê hate lidarxistin.
- 22.09.1982-Filmê Yılmaz Güney "Rê" (Yol) di mîhrîcana

Cannes'ê de xelata "Palmiye ya zêr" wergirt.


- 24.09.1996-Qontrayan êrişê girtîgeha Amedê kirin, di encama êrişê de, 10 girtiyên PKK'yî hatin qetilkirin.
- 24.09.1993-Welatparezê kurd Mehmet Özdemir li Amedê ji hêla qontrayan ve hate qetilkirin.
- 25.09.1993- Îhsan Güneş li Batmanê ji hêla hizb-qontrayan ve hate qetilkirin.
- 26.09.1993- M. Salih Çakır li Batmanê ji hêla qontrayan ve hate qetilkirin.

AWIR

Kişttoxê Metînî jî viradiyay

ÇAVDÊRÎ

AMED TÎGRÎRS



Nivîsa nivîskarê me nekete destê me

Mehkemawa rojnameger Metin Göktepe ya 8'in, 15'ê meng de Afyon de ramit û mehkema çahar kişttoxê (katil) Metînî viraday.

Zek yeno zanayin 7'ê menga rêben-dana 1996 de polîsan Metin Göktepe zeredê Salona Spor a Eyüp de îşkencewa kişt bi. Verî vat bi, Metin dês ra gina waro, mard. La belê reaksiyonî ser, îşkencewa kiştên qabûl kerd û haqdê kiştoxan dê Metînî de mehkemawa Eyüp de doz abiyê.

Xora se bi jî nûwa tebya bi, mehkema Eyüp ra çebiyê Aydın, wija ra jî çebiyê Afyon. Bêguman dewlet wina kerd ke, şar peyê na doz (dahva) virado û wa xo vîra kiro.

La belê zey wastena dewlet nêbî, şarî peyê na doz nêvirada û vat: "Hetanî kişttoxê Metînî mehkema verî meveyê û cezawo ke kerdo haq, ey megrê ma dê peyê na doz meviradim." Rastî jî şarî wina kerd û qe peyê na mehkema nêvirada.

çim ra vinî kiro. Ewna oyo wina nêbeno, xora (zaten) polîsî jî niyameyê (dewlet jî nêwastê bêrê) mehkeme û reaksiyon jî roj ra roj biyê vêşî (rastî rojnamanê bînan û ê teverî jî destek dayê) qandê coya serokwezîrê dewleta tirk Mesut Yılmazî fermann da û vat: "Polîsê ke Metin kiştî inan vejê mehkema ver". Nê fermannî di ma kişttoxê Meti-

bî. Polîsî mehkemawa verin de bêveng mendî, ê 2'in de yanê na mehkemawa peyin de bêvengîne xo xerpina, qisey kardî û vat: "Ma Metîn nêkiştî, Metin xo terîst o û rojnamewo ke tey xeptiyayê o jî, ê terîstano û dêsê keyedê ci de jî nivîsê DHKP/C estq. Nê polîsan pey ra wina vat: "İfadeyo ke ma verî da, ma o zordê îşkenceya da û mayê, ê ifadey q a -

wan.

16'ê meng de nûstoxê rojnameyê Râdikal, Koray Düzgörenî jî nêzdiyê nê vînayinan nûst bi û vînayîne xo wina ard bî zîwan: "Oyo winî ayseno ke, giştî hemû serdaranê (üst düzey yöneticilerinin) dewlet nê çetan miyan de esta û na jî polîtîkaya dewleta miyanîkî (dizdanî) ya. Nê viraştîne benê û dewleta biryaranê (qararanê) nînan jî miyanîkî gena û miyanîkî dana virastin û xeberê nînan jî qe jew wext nêvejyênê tever."

Ancî nûstoxê Radikal, Celal Başlangıçî 15'ê meng de quncikda xo de mehkema Metin Göktepey û Korkut Ekenî sero vindart bi û vînayîne xo wina ard bî zîwan: "Karê Korkut Ekenî, Afyon de çiçyo?. Ekeno 3'ê mehkemeyo Afyon de vînyeno (mehkemayê verînan de wardengehan (lokantan) de vînya, na fin kever dê mehkema de vînya) û perskerdînan de vano" ez Antalya ra şiyê Enqere qandê coya, mi Afyon de solix (mola) dê û ez qandê mehkema niyamawa Afyon."

Zey nê vînayinan xeylê vînayînî nê rojanê peyinan de rojnaman de nûs-yenê. Nê vînayînî rast ê, şaro ke mayê pa qisey kem iyê jî nê vînayinan anê zîwan û nînan qabûl kenê û vanê na dewlet, dewlet biyan ra vejyawa û biya dewleta çeteyan. Ek na dewlet, dewleta demokrasî û ê hûqûqî biyayê persbenoyê polîsan ra Sedat Demir, Deniz Gökçetin, Halim Apaydın, serokê tîmê taybetano verînan "kişttox" İbrahim Şahin, embazê (hevalê) ci û kişttoxê Metin Göktepey nêviradyayê û kesî nêşayê nê kiştoxan ra vajo: "Tirkiye şimawa bena berz!"

MEMED DREWŞ

Dewlet senî kerd nêşa mehkema şarî nî xo şî Afyon û teslîmê dozgerî (savcî)

bûl nêkem" û mehkema nê kiştoxan ra 4 kişttoxî viraday. Oyo winî ayseno mehkema bîn de jî, ê bînê viradyê.

Mayê çira wina vam? Çimke roşnikaran, nûstoxan û siyasetkarane kurdan 5-6 seriyo vatê: "Na dewlet, dewleta kont-ra û çetan a, çiqas karê liminê (qilêrinê) benê, destê dewlet tede esta". La belê dewlet jî qandê nê vatenan inan rê vatê: "Nê ciyakar ê (ayrılıklı) niyê wazenê Tirkiyê ciya kirê, letey kirê û birjinê. La belê mayê ewro ewnem vînayîne ke kurdan verdê 5-6 seran ardê zîwan, ê vînayinan ewro xeylê nûstoxê tirkê jî anê zî-

Qursa ziman û edebiyata kurdî

Di 15.10.1997'an de li Înstîtuya Kurdî, qursa ziman û edebiyata Kurdî di dest pê bike. Kesên ku dixwazin beşdar bibin divê ku heta 30'ê rezberê (îlon) serî li Înstîtuyê Kurdî bidin û navê xwe bidin nivîsandin.

Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê

Divê kes nebêje: Qet çênabe

Îmam Gassan Solomon, bi navê xwe yê ku Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan lê kiriye Hevrê Silêman, Nimîndeyê Parlamentoya Kongreya Neteweyî ya Afrîkayê û Berpirsê Karê Dadî û Têkiliyên Derve ye. Ev mirovê hêja bi raman û çalakiyên xwe dostaniya gelê kurd dike. Lewre jî ew di demeke kin de ji aliyê gelê kurd ve hate nasîn û jê hate hezkirin. Her wiha wî bi helwesta xwe dijminatîya dewleta tirk qezenc kir. DGM'ê ew bi cudaxwaziyê sûcdar kir. Dema Solomon ji bo çalakiya Trêna Aştiyê hate Stenbolê me pê re hevpeyvînek pêk anî, em wê hevpeyvîne pêşkêşî we dikin.



Rewşa me jî li Afrîkaya Başûr nêzî rewşa kurdan bû, me jî bi dehsalan ji nîjadperestiyê kişand. Me bi riya gotûbêjan kêşeya xwe çareser kir. Ez ji dil bawer dikim ku wê ji bo çareseriyê dewleta tirk jî rojekê bi rêberên kurdan re rûne.

Pirsa me ya yekemîn ev e, hûn ji bo çî hatin vê derê?

□ Ez, ji bo ku beşdariyê di însiyatîfa afrîner, Trêna Aştiyê ya Musa Anter de bikim li vir im. Ez dibêjim însiyatîfa afrîner, ji ber ku ev yekemîn însiyatîf e ji bo çareserîya kêşeya kurd. Vê çalakiyê kêşeya kurd anî rojeva cihanê, rojeva Tirkîyeyê û di nav hemû rêxistinên de, bi taybetî jî yên kurd de doza aştiyê deng veda. Ji bilî çareserîya aştiyane ji kêşeya kurd re tu çareserî nîn e. Her wiha rewşa me jî li Afrîkaya Başûr nêzî rewşa kurdan bû, me jî bi dehsalan ji nîjadperestiyê kişand. Me bi riya azîneyên aştiyane kêşeya xwe çareser kir.

Her wiha li ber me mînakeke din heye, îro Îngilistan bi Sin Feinê re gotûbêjan dike. Li bakurê Îrlandayê niha şer rawestiyaye. Ez ji dil bawer im ku divê ji bo çareseriyê dewleta tirk bi rêberên kurdan re rûne.

Ev çalakî wekî propagandaya PKK'ê tê binavkirin, hûn li ser vê yekê dikarin çî bibêjin?

□ Hemû tevgerên azadîxwaz di vê riye de derbas bûne, dema serokên van tevgeran nêzî rizgariyê dibin, li çareserîya aştiyane digerin. Hinekên ku berjewendiyên wan ên siyasî û aborî di domandina şer de hene, ji bo ku eleqeya gel ya ji bo vê têkoşinê kêmbikin, li dijî xebatên

west ku were ser riya danûstandinê, lê wê ji me re digot: "Hûn terorîst, komûnîst in" me jî dest avêt çekan. Dema riya danûstandinê vebû, agirbest hate rojevê.

Gelê Afrîkaya Başûr li ser kêşeya kurd çiqas xwedan agahî ye?

□ Gelê Afrîkaya Başûr li ser kêşeya kurd hestiyar e, lê agahiyên li ser kurdan kêmbin. Niha me li Afrîkaya Başûr Komara Tevergera Mafên Mirovan a Kurd ava kiriye, ez endamê wê komê me. Em agahiyên li ser kirinên dewleta tirk û çalakiyên PKK'ê li nav gelê Afrîkaya Başûr belav dikin. Ne tenê gelê Afrîkaya Başûr piştevaniya me dike, her wiha gelek endamên parlamentoyê jî piştigiriya tevgera azadîxwaz a kurd dikin. Bo nimûne zêdetirî 50 endamên Kongreya Neteweyî ya Afrîkaya Başûr, danezana ji bo piştigiriya Trêna Aştiyê ya Musa Anter îmze kir.

Li nik min nameyek ji bûroya Metran Tutu jî heye, ew li Dewletên Yekbûyî Amerîkayê, li New Yorkê ye, me nameyê jê re şandibû da ku bala xwe bide rewşa gelê kurd, wî jî bersiv daye û daye zanîn ku bi çalakiyêke wiha kêfxweş bûye, piştevaniya wê dike.

Heke hûn serboriyên xwe jî li ber çavan bigirin, gelo bi dîtina we kêşeyêke bi vî rengî çawa çareser dibe?

□ Wekî hikûmeta Afrîkaya Başûr, em di warê meşandina gengeşiyên ji bo çareserîya siyasî de xwedî tecrûbe ne. Lewre kêşeya me yek ji diwartirîn kêşeyên li ser rûyê cihanê bû. Dema di sala 1994'an de hîlbijartina yekemîn çêbû, kesî bawer nedikir ku emê vê encamê bi dest bixin, piştî ku em bi ser ketin her kes şaşwaz ma.

Ez bawer im mirov dikare ji tecrûbeyên Serok Mandela kelkê wergire ji bo dîtina modeleke ku riya gotûbêjan vebike. Me ji bo Afrîkaya Başûr riyek dît, me gelê xwe kir şîrikê desthilatîyê.

Em nikarin riyekê an jî modelekê bidin ber gelê kurd. Gelê kurd dixwaze bila doza federasyonê, an jî doza serxwebûnê bike, ew bi dilê xwe ye.

Tiştê ku em dibêjin ev e; pêşî divê rêveberên gelê kurd xwe bi cihanê û bi taybetî jî bi hikûmeta tirk bidin nasîn. Gava duyemîn jî, divê her du alî li hev rûnin, kêşeyê niqaş bikin. Em ji xwe dizanin, ew ne karekî hêsan e û ne di demeke kurt de pêk hatiye. Li Afrîkaya Başûr ji bo ku em bigihêjin vê qonaxê me bi salan şer kir. Dil dixwaze ev çalakî bibe gava yekemîn di riya aştiyê de, pêwîst e dewleta tirk ji vê çalakiyê sûde wergire.

Hûn helwesta dewleta tirk çawa dibînin?

□ Divê dewleta tirk bi hişkehişk nêzîkiyê di meseleyê nede, niha wisa xuya dike. Serboriyên me yên di vî warî de he-

ne, ne tenê li Afrîkaya Başûr li cihên din jî kêşeyên bi vî rengî bi riya diyalogê çareser bûne.

Di vî warî de baweriya hişk ne guncan e, mirovan paşê şermezar derdixe. Bo nimûne Serokê Rodezyayê Iyen Smith niha bûye Zimbawê, demekê jî serokê tevgera rizgariyê Mugabî re ku niha Serokê Zimbawê ye, got: "Ez tu car bi we re li hev rûnim, lewre hûn terorist in." Lê heman kes piştî şeş mehan derket televîzyonê û da zanîn ku wî ji bo berjewendiyên welatê xwe hevdiîna bi vî tevgerê re pejirandiye. Li Namîbya jî wisa bû, li Afrîkaya Başûr dîsa wisa. Lewre divê kes nebêje qet çênabe. Li Afrîkaya Başûr De Klerk got: "Qet çênabe.", lê çêbû. Hikûmeta tirk jî wê ji hevrê Öcalan re bibêje: "Qet çênabe" lê wê rojekê rastiye bibîne û pê re li dor maseyekê rûne.

Têkiliyên hikûmeta Afrîkaya Başûr bi PKDW'ê re hene?

□ Endamên Parlamentoya Kurdistanê li Dervêyî Welêt (PKDW) berî çend mehan hatin Afrîkaya Başûr, em bi hev re peyivîn, her wiha wan bi çend wezîrên Afrîkaya Başûr re jî hevdiîtin pêk anîn. Em bi hatina wan pîr kêfxweş bûn.

Gelo derfet heye ku hûn jî mîna parlamententerên yewnanî Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan vexwînin parlamentoya Afrîkaya Başûr?

□ Ez nikarim bi awayekî qethî bibêjim ku wê hikûmeta Afrîkaya Başûr Öcalan vexwîne, lê ev yek heye; hinek rêberên tevgerên rizgariyê yên welatên din hatin Afrîkaya Başûr, bi Serok Mandela re hevdiîtin pêk anîn û ji bo kêşeya xwe alîkarî xwestin. Bo nimûne bi qasî ku ez ji BBC'yê fêr bûm, van rojên dawîn serokê komeke Cankana, tevgerê jî başûrê Sudanê dê biçe Afrîkaya Başûr, bi Mandela re hevdiîtinê pêk bîne. Dibe ku di rojên pêş de ew derfet jî bo hevrê Öcalan jî çêbe.

We ji nijadperestiyê gelekî kişand, hûn dikarin bibêjin îro hemû arîşe ji navê rabûne?

□ Na, ez nikarim bibê-



Geleşeyên ku didomin zêdetirî 50 salî de derketine holê, di nava du sê salan de jî holê ranabin. Di warê çareseriyê de me gava yekemîn avêt, ev jî ji bo têkbirina nijadperestiyê nivîsandina destûrnameyê demokratîk bû.

jim li Afrîkaya Başûr kêşe yekser çareser bûye. Geleşeyên ku di domana zêdetirî 50 salî de derketine holê, di nava du sê salan de jî holê ranabin. Di warê çareseriyê de gava yekemîn hate avêtin, ew jî ji bo têkbirina nijadperestiyê nivîsandina destûrnameyê

(qanûna bingehîn) demokratîk bû. Di vî destûrnameyê de mafê mirovan ên bingehîn hatine destnîşankirin. Mafên mirovan parçeyekî destûrnameya me ye. Ev maf jî bo hemû welatiyan e; bêtir cudakirina nijad, ziman û taybetiyên din. Niha li Afrîkaya Başûr yanzdeh ziman hene, gelek komekên etnîkî hene; ev maf jî gişkan re ne. Bêtir liberçav-girtina van cudatiyan, hemû welatiyên Afrîkaya Başûr li hemb-

erî zagonan wekî hev in. Hikûmeteke me ya cihêreng heye, ew ne di ser destûrnameyê re ye. Tu zagon nikarin bi destûrnameyê re bikevin nakokiyê, destûrname hemû welatiyan diparêze; ji Serok bigire, heta karkerekî; çî jin çî jî mêr...

Serpêhatiyê ku qet ji bira we neçûye heye gelo?

□ Ez dixwazim serpêhatiyê gelek kurt vebêjim ku di sala 1983'yan de li Afrîkaya Başûr pêk hatiye. Em diçûn merasîma veşartina 12 kesên ku ji hêla hêzên dewletê ve hatine kuştin, min dixwest bi malbatên wan re axaftinekê bikin, hêzên artêşa Afrîkaya Başûr, biryar dabûn ku rê li ber çûna me bigirin. Diviyabû em di ser pîrekê re derbas bibin, lê leşkeran çek di dest de li ser pîrê cihê xwe girtibûn, xwestin me rawestînin. Berê çekên xwe dane me, hevalên bi min re xwestin rawestînin û bi leşkeran re nîqaşê bikin, lê min got nesekinin, divê em bimeşin. Wan berê çekên xwe dabûn me ku li me bixin, lê roja şemiyê bû bi sedan kes li derdorê hebûn, lewre min dizanibû ku nikarin li me bidin. Em meşiyên, dema 15 metro ma fermandar fermana gulbaranê da, lê em ranewestiyên, dema em hatin nik wan, em jî di şûna xwe de rûniştin, fermandar biryara girtina me da, leşkeran em kaş kirin birin erebeyê, rojnamegerên li derdorê, wêneyê vê dimenê kişandin, ew wêne li seranserê cihanê belav bûn.

Divê ez bibêjim ku gelek kes bi vî awayî hatin kuştin, lê şansê me hebû em nehatin kuştin, wêneyê me jî hêla nûçe-gihanên BBC'yê ve hatin kişandin û di nava saet û nîvê de li seranserê cihanê belav bûn.

We di daxuyaniyê xwe de helwesta Almanya rexne kiribû, hûn dikarin hine-

kî li ser vî mijarê rawestînin?

□ Tiştê ku em ji Almaniyayê fêr nakin ev e, Almanya welatekî demokratîk e, me gelek tişt ji destûrnameya Almaniyayê wergirtin ji bo destûrnameya xwe ya nû. Lewre jî dema ku wê Trêna Aştiyê rawestand em şaş û metel man. Min ji Almaniyayê hêvî dikir ku wekî endameke Yekîtiya Ewrûpayê bi dilxweşî destûrê bide vî çalakiyê û bihêle ku ji kêşeya kurd re çareseriyêke aştiyane bê diîtin.

Piştî her tiştî ewrûpî di dema şerê cihanê yê yekemîn de bûn sedema parçebûna Kurdistanê, ev derfetek e ji bo rastkirina vî xeletiyê di dîrokê de. Lewre jî ez fêr nakim ka ji ber çî sedemê Almaniyayê rê li ber vî çalakiyê girt. Heke hinek geleşeyên wê bi PKK'ê re hebin jî, diviyabû Almanya bianiya bira xwe ku 30 milyon kurd ji şerê ş û azarê dikişînin, diviyabû ew dewlet li van mirovan bifikiya.

Me diît we di MED-TV de ji Quranê hinek ayet xwendin, gelo hûn têkiliya sosyalîzme û olê çawa şîrove dikin?

□ Ola îslam payeyeke berz dide kesên ku pirtirîn tîr çewsandin. Ayetên ku min ji Quranê pîroz girtin, bi giranî ew ayet in ku qala kesên çewsandî, zehmetkêş dikin.

Me li Afrîkaya Başûr gelekî renc û zehmetî kişand, gelê kurd û pîr gelên din jî tîr çewsandin. Xwedê dixwaze ev kes rizgar bibin, ev kes pêşengiya gelên cihanê bikin û ji keda xwe sûtê wergirin da ku kes keda wan nexwe. Mihemed Pêxember (S.A.V.), dîsa piştevaniya kesên bindest û keşkar dikir. Îslam ne ew tişt e ku yek here mizgeftê li ber Xwedê destê xwe veke, duayan bike. Îslam dide zanîn ku Xwedê yek e, mirovahî jî yek e û tu car li gorî reng û zimanê wan, dubendiyê naxe nava mirovan

Partî û dîroka mêran



Partî jiyaneke pastoral e
bi tenê li wir azad in
Berxo û berxê

û hovîtiya mirov a hişaza
dîrok jî nîrxandîye
bi pênuşa mêran
lewma parastina femînîstên burjûwa
hewte hewta fêlanê bêvanê ye

Partî jiyaneke pastoral e
li wir azadbûn hewcedarî ye
partî parkît û pêrkît e
ji wê em dikarin
bi belavbûna rojê
bi axme-taxmêbûna jiyane
serayan ava bikin
hevokên bi wate jî...
hin kesan/ hin ûnsûran
bixwazin dikarin bimînin
li hundir kozên komaran
welatê windabûyî
jixwe tawanbariya giran e

ên vî dizanin
şehîd in di axa welatê xwe de jixwe

Kêm û zêde partî ev e
lê partî dîrok e
xeynî dîroka mêran
partî di pastoraltiya xwe de
dîroka mêt û jin e

Nim ja sib

Saet şeşê sibê ye
li hemberî xizaniya dilekî
mehrûm
xemgîn
rûsar
mêtinger
dagirker
tenik û daketî
şerekî dijwar didomînim
am dinivîsim
am jî gule diteqînim

belan foyînek li derve
ne bi erebî, ne bi farisî, ne jî bi tirkî,
rast û dirust bi goyînî distirê
rast û dilşa bi goyînî nimêj
dikezirawê dikim
çima pişaftina leqleqan li ser çivî-
kanbi bandor nine

Saet şeşê sibê ye
bavê min li ser nimêjê
kilamên qureysî distirê
bi erebî dinale
li ser parzemîna sicada farisî

xwestekên wî jî ji Yezdan
bi tirkî ye

tu dibêjî qey
li bi huştê jî Kurdistan nîn e

KAWA NEM

Hindik Maye

Hindik maye
emê dilana xwe li dar kin
emê dara zavê bixemilînin
heftê rengî, heftê fêkî pê ve bikin
Ji kêf û şahiyê emê binê asimên qul kin
bi guleyên keleşan...

Bê çawa diranên me,
bi nav zebeşekî sor î Amedê de diçe
Emê wisa di nav werzê azadiyê de bimeşin
êdî zordar nîn e
Xwediyê mala xwe em in
Em destê xwe dirêj bikin, wê bigihêjî stêran
Em li ser sifreya xwe rûken
pariyê me di gewriya me de namîne.
û xewa me ya şerîn êdî nayê xerakirin
bi dengê wan zebaniyan
êdî wê tekevin nav tîngan
êrişên berbangan...
û zarok hew dikin zûr zûr ji tîrsê
pêlistoka keçika bale
hew dikeve bin potînen genî...
Dîvêt em welêt bikin bihuşt,
ew destên bi kevir
dîvêt bibîne wekî pertalekî qehweyî
û axa me ya ku jî kerba avê
devê xwe mîna hûteki vekirîye
dîvêt ku tîna dilê xwe bişkîne
Ma Dîjle û Ferat ji çi re ne?
Wê memikên xwe bikîne devê Heranê
ta ku bigihêje deşta Silopî...
Deşta İdirê havînî spî, ji pembû,
Zivistanê spî ji berfê,
mişmişê Meletiyê wekî hinguv
Penîrê serhede, tutîna Semsûrê

û fistikê Nîzîbê dewle-
mendiya warê
me...
Xortên nû, jiyana nû,
Ji dinyaye ke nû re mizgînî
ne
li dinya ku hêviya Sosyalizmê
bûye çirûsk
Êdî stranên me jî tîn
guhertin
Ne bila bişewite kela zilmê
Şewitî kela zilmê
îro roj roja me ye...
Bila çavên te li paş nemînin
tu rehet razê heval Delîl
"Dilan gelek xweş e
dilê dijmin reş e..."

Ji welat min end w ne

Raperîn xwe berdidin
ji nav penûsa min
Ji nav lêvê min agir dipijiqe
dilê min bi gurpe gurrp...
Sedsaliya bîstemîn
di gavavêtina bîstûyekemîn de
mirovatî di destavêtinên herî nû de
Lê li welatê min
wêneyên mîna Qempa Auschwitz
yên dema Hitler
jin û mêtên çav bi terîşê reş girtî
gund û bajarên wêrankirî



zevî û xaniyên şewitî,
gorên kizirî,
hêlinên perpiî...
mirî êdî nikarin cila li xwe kin
yên destgirtî nikarin bidine hev ramûsan
û sosin êdî şîna nabin di bin napalmande...
-Ew benderên zarokatiyê tev şewitî-
Di hembêza sedsaliya bîstûyekemîn de-
parastina beqan, reqan û şînahiyê tê axavtin
lê qulingên me
hacîreşk û zezûl êdî nayên warê me
Hey lêê!
Kilkirina çavan jî ji te re -
Bewate ye zerya min...
Ew biskên tîn ên şevînî
neşekirî bin jî dibe, xezala min...

HESEN ZINA



Li nevendên çandê, çalakiyên ve hefteyê
Li Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbolê
● **20.09.1997. Şemf:** Bernameya taybet ji bo bîranîna Apê Musa
Saet:14:30
Konsera Koma Rojhilat Saet:18:30
● **21.09.1997 Yekşem:** Ji beşa sinemayê "Xelatdayîna Pêşbazîya Çirokan" Saet:14:30
NÇM- Konsera Koma Çiya
● **24.09.1997 Çarşem:** Panel-Înstîtuya Kurdî ji bo Bîranîna Apê Musa. Axîfger: Feqî Hûseyin Sağnîç, Canip Yıldırım, Dicle Anter. Saet:

18:00

● **26.09.1997 În:** Ji beşa sinemayê Fîlm: Hêvî derhêner: Yılmaz Güney saet:18:00
Li Beksavê


● **20.09.1997 Şemf:** Panel: Pirsgirêkên perwerdehiyê. axîfger: Kemal Bal (Eğitim-Sen), Erdem Önal (Gerinendeyê Giştî Rojnâmeya Ülke-de Gündemê) saet:16.00

● **21.09.1997 Yekşem:** Fîlm: "Kerî" derhêner: Yılmaz Güney Saet:15:00 Fîlm: "Acî" derhêner: Yılmaz Güney Saet:18:00

● **22.09.1997 Duşem:** Fîlm: "Düşman" derhêner: Şerif Gören

AWIR

Bi Zimanê Tirpanê



Roja 13'ê rezbera 97'an li Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbolê "Koma Serhildan" ku hunera folklorîk pêk tîne, bi listikeke ji dorhêla Agiriyê derket hemberî temaşevanan.

Koma Serhildan beriya ku dilanê pêşkêş bike, kurte-şanoyêk û nîşandana slaytê kir. Di destpêka kurte-şanoyê de palehiya gundan bi qirînê (tirpan) hate pêşkêşkirin. Jixwe navê listika xwe jî "Bi zimanê tirpanê Bazîd" danîne. Her wiha di kurte-şanoyê de li ser berfa Çiyayê Agirî, li ser zehmetiya gel ku li serî dîtiye û li ser bilindahiya çiya tê rawestîn. Di vê kurte-şanoyê de Ehmedê Xanî jî, nehatiyê jibîrkirin.

Belê Çiyayê Agirî, bi erebî Cebel-el Haris, bi farisî Kuhe Nuh yanî Çiyayê Nuh, di Tevratê de dibêjin di 17'ê meha fîrmehê de keştiya Nuh li serê Çiyayê Agirî daniye. Bi latinî Çiyayê Ararat, çiyayê zilm û zorê ye. Bajarê Ararat paytextî ji Ermeniyên re jî kiriye. Ermenî, ji vî çiyayî re Masîs dibêjin. Her wiha Koma Serhildan jî ev çiyayê bi nav û deng tevî dîlana kurdî kir û pêşkêşî gel kir. Ligel van yekan, di slaytan de der barê folklorê kurdî de, kincên Agiriyê û hwd. hatin nîşandayîn. Vê yekê çalaki xweşik û bi bandor kir, ji her alî ve nîşandayîna slaytê, cihêrengiya xwe di dîlana kurdî de derdixist pêş.

**Kurte-dîroka
Koma Serhildan**

Li gorî agahiyên endamên komê, Koma Serhildan di sala 1991'ê de ji aliyê 12 kesan ve hatiye avakirin. Beriya ku ev kom di nava NÇM'ê de cih bigire, kar û xebatên xwe li HEP'a Gaziosmanpaşayê bi rê ve birine. Piştî damezirandina NÇM'ê kom jî dikeve nav xebatên saziyê.

Koma Serhildan, ji listikên Kurdistanê cara yekemîn listikên Semsûrê (Adiyaman) listine. Piştî Koma Serhildan bi armanca jiyandina listikên hemû herêmên Kurdistanê dest bi xebatê dike, di demeke kin de listikên Amed, Muş, Agirî, Wan, Culemêrg (Hekarî) û Mêrdîn fêr dibin û pêşkêşî gel dikin.


Ligel van yekan, Koma Serhildan ji hemû herêmên Kurdistanê listikên cur bi cur pêşkêş kirine û bi vî rengî jî di nav gel de bûye xwediyê cihekî taybet.

Koma Serhildan, heta vê gavê sê "Pêşangehên Hunerên Neqîşîn" çêkiriye. Yek ji van pêşangehan ji bo Mamoste İsmail Beşikçi hatiye lidarxistin. Tevî vê yekê di sala 1993'yan de Komê hunera xwe li başûrê Kurdistanê pêşkêşî gel kiriye. Her wiha ev kom li gelek cihên Tirkiyeyê jî geriyaye û listikên xwe pêşkêşî gel kirine.

Di 300 saliya Ehmedê Xanî ku, di sala 1995'an de hatibû daxuyandin, Koma Serhildan jî, ji bo bîranîna wî di heman salê de, şahiyêke bi navê "Şahiya listikên gel a Ehmedê Xanî" lidar xistibû.

AZAD AVAŞIN

TÎŞK



BEKIR BAHOZ

Nivîsa nivîskarê
me nekete destê
me

Kargeha Hunerên Bedew "Keskesor" vebû

Keskesor kargeha wêneyan, peykarên û hunerên plastîkî ye. Ev sazî ji aliyê NÇM'ê ve hatiye avakirin. Ji aliyê kurdên bakurî ve yekemîn çar avahiyeke bi rengî tê damezrandin. Her çiqas hunera wêneyan ji bo gelên cihanê di merhaleyêke bilind be jî, ji bo kurdan ji bo îro tiştekî pir pêwîst e. Heta niha çanda wêneyan di nav kurdan de bi cih nebûye. Her çiqas li başûrê Kurdistanê hin wênesazên kurdan ji aliyê akademîk ve gihîştibin jî, bandora wan li ser kurdên Bakur zêde çênebûye. Lewre kurd li vî parçeyî bi nasnameya xwe nehatine nasîn. Ev yek jî ji bo pêşketina hunera wêneyan yekemîn asteng e.

Li gorî Berpîrsê Kargeha Keskesor Feyzî Bilge ev kar gelekî dereng maye. Bilge dereng mayina vî karî ji bi mercên ne-asayî ve girê dide

Ji aliyê din ve Feyzî Bilge li ser armanca vê saziyê jî daxuyand ku, ew dixwazî li pey xwe keleporekê û şopekê bihêlin. Feyzî Bilge bi bîr dixwe ku gelên cihanê bi wêneyan xwe îfade dikin. Hêviya kargehê ew e ku valahiya di vî warî dagire.

Her wekî din Bilge dide zanîn ku wêne di dîroka kurdan de cihekî taybet girtiye û bîngeheke peyker û muzîkê heye lê ya wêneya nûn e. Dîsa wî got ku çandeke kurdan heye ku bi tenê bi wêneya dikare xwe derxine holê.

Berpîrsê Keskesorê Bilge, vê gavê, wekî gavêke profesyonel bi nav dîke û dibêje: "Wê ev gav me ji amatoriyê xelas bike."

Der barê pêşketina ve hunerê de Bilge diyar dike ku, alîkariya saziyên kurdan gelekî pêwîst e. Bilge bi bîr dixwe ku hunera wêneyan bi saya avahiyên siyâsî di nava cihanê de cih girtiye.

Bilge tevî vê yekê lê zêde dike û dibêje: "Me hetanî ve gavê ev yek pêk neanî, mimkûn e ku me ji xwe hez nekiribe. Em bêhtir cih didin hunermerdên din." Her wiha Bilge der barê ne nasandîna de gazinan xwe dike û dibêje: "Hunermerdên ku li Tirkiyeyê û li welat neyê nasîn, di nava hunerên navneteweyî jî nasîna wî gelekî dijwar e."

Kargeh wê di warê niqandina wênesazan de gelekî baldar be, wê bêhtir wênesazên ku bi nasnameya neteweyî tîna nasîn bîna pejirandin.

Bilge diyar dike ku, vê kargeh ji hunera wênesazê başûrê jî îstîfade bike. Li gor wî sê çar wênesazên Başûr û Rojhilat di nav xebatên kargehê de cih digirin.

Fewzî Bilge dide zanîn xebatên bi vî rengî zêdetir bibin, lewre ku pêwîstiyê kurdên Bakur avakirina akademiyekê heye. Bilge balê dikişîne ser bandora neyînî ya akademiyên tirkan û dide zanîn ku ew nikarin ji kesên ku li wan akamediyên hatine perwerdekirin, sîdê wergirin. Lewre zarokên kurd ku ji akamediyên mezûn dibin, di nav tekoşîna gelê kurd te cih nagirin. Ji bo projeyên xwe yê pêşerojê jî Feyzî Bilge dide xuyandin ku niha li Edeneyê û Amedê daxwaza damezrandina kargehên bi vî rengî heye.

AZAD ALTUN

Karwanê revê

– Hey Îbo! dinya ji te re jî namîne...

– Ma ji kê re maye da ku ji min re bimîne lo...! Ji pêxemberan re nemaye, ji sultan û paşe û axeyan re nemaye...! Wê çawa ji Îboyê koçber re bimîne?

Ev bersivên hanê ji dil û hinavên Îbo derdiketin, bi hesret û xem. Ji dilên wî mîna volkanan, azar di-barîn, ji çavên wî jî, mîna brûskan agir û êtûn diwe-

şyan.

– De here lo!.. Tu jî îro, tinazên xwe bi Îbo bike...

Ev salek zivirî û hê Îbo li çi cihan akincî nebûye. Di dawiya Newroza îsal de, bextê xwe yê reş, da ber pêlên feleka bê emek û rewş, di şeveqa bê deng û sar de bi hevaltiya deh kesan xwe dît di paşiya kamyoneke biçûk a veguhestina goştî de, ji bajarê mezin ê

Mîr Celadetê Bedirxanî ku lê çavên xwe vekiribûn, derketin. Tenê stêrên li bilindahiya ezman û heyva geş, li Îbo û hevalên wî dinihêrt. Wan dizanibû ku ev karwanê biçûk bi hêviyên xwe derbasî riyên tirsonek û pir nexweş dibe.

De here Îbo... Te xemên xwe tev li pişt guhên xwe avêtin, te rewşa xwinavî ya welat bi yek carî hişt û hêla. Xewn û hêviyên te ew bûn ku tu welatê xwe wilo azad û serbest bi her du çavên xwe bibîn. Lê tu çima îro ji welat direvî û ber bi welatên biyanî ve diçî?!....

Zû... zû... werin.. em gihîştin...! Îbo, xewa vê şeva şêrîn ji çavên xwe direvîne, xwe li vê rîya hat û batê, avête ser milên xwe û xwe ji kamyonê avêt, hevalên wî jî her wisa. Rêberên wan digot yek bi yek li dû hev werin.

Wî karwanê biçûk, da rê û yên ku diçin, jiyana her yekî ji wan bi hêviya geş e, da ku li elinda dotirra rojê, ji robarê avê derbasî wî aliyê sînorê welatê hêviyan bibin û karwanê wan bidomîne.

De here Îbo... Bîra te tê çaxa te li civînên heval û hogiran digot: “Çima ev xortên me ji welat direvin?” Te tinazên xwe bi wan dikirin. Çend hevalên te jî çûn û li welatê biyanî akincî bûn û name jî ji te re dişandin, pêsên wan welatên xerîb didan, tevan jî, hesreta welat û rindiya wî di dil de bûn, xemên giran ên rewşa xerab a îro ya welat, di nav rûpelên nameyên wan de bûn. Lê Îbo çima îro tu jî ber bi sînorên wan welatan de diçî?!

Karwanê hêviyan wê biçe, dengê rêveçûna wan di nav teqû û heriya giran de û li nav kûrên avên baranan, tenê pêlên bédengiya vê şeva dirêj û sar bi deng û hişyar dike, dil û wîcdanan dilivîne û dihejîne.

Ax... we çima hişt em ji welatê xwe birevin û bivekin nava vê rewşa xerab û tirsonek, van îşkence û zêmaran bidin ber me, hey mala we xerab û wêran bibe!..

Bîra te tê Îbo; çaxa te ji hevalan re digot: “Çima xortên me ji welat koç dikin..?” Li bîra min e rojekê te wiha digot:

– Piraniya xortên me, mixabin pereyên ew qas pir didin, da ku ji welat birevin û herin welatên din, ew qas pere dikaribû piraniya hêjarên welat, ji birçîbûn û mirinê rizgar bike.

Lê îro, tu jî gihîştî karwanê revê û tu ber bi sînorên wan welatan ve diçî...!

We çima ji me re got: Emê bi nîv saetê bigihêjin ser robar û derbasî sînorê welatê hêviyan bibin. Ev sê saetên tirsonek in ku em di vê rîya sext û agirîn de ne, lê hê negihîştine wir. Li welat şerê birakujî û wêrankeriyê em anîn ber vê rewşa dilşewat û perîşan û li vir jî hûn rêberên van rîyan, bazirganiyê bi me re dikin. Karwanê revê di sextirîn rê de diçe, tev bêaram û perîşan bûne. Rêber jî diqîre, haydê lez bikin, zû werin, em zû bigihêjin ser robarê avê û derbas bibin.

Kûrên teqû û heriyê, karwanî ji hev dike, çendek heya ser çokên piyan dikevin nav, lingekî derdixin ê din diçe nav. Heya dawên reş ên şevê jî, ji rewşa karwaniyan xemgîn dikevin û wexer dikin. Tîroşkên geş ên davên rojê nû, perda rêbaza karwanê revê li ser sînorê welatê hêviyan, daye ber çavên eskerên sînorê vî alî û hêviyên karwanê biçûk hilweşandin.

ZARAYÊ BAŞÛRÎ



Hinekan ji nezaniyê/ Hinekan ji xizaniyê/ Hinekan jî mîna Îbo piştî tevger û têkoşîna salan/ Dev ji welatê xwe berdan, dan pey hêviyên pûç/ Ev çîroka Îbo ye/ Îboyê ku digot: Pereyên ku diçin ji bazirganan re, dikarin gelek birçiyên welatê tîr bikin/ Rojekê welat hişt û da ser rîya revê/ Li ser kamyonekê xwe gihand sînorê “welatê hêviyê”/ Lê firêjen rojê ku dilê gelek geş dikin; dema li ser sînor dane der/ Hêviya karwanê revê di nav reşariyê de hiştin.

Li ser kurdan xebateke akademîk


Bi geşbûna têkoşîna neteweyî pirsgirêka kurd û Kurdistanê li her aliyê dinyayê û bi taybetî li Ewropayê dibe mijarek balkêş ji bo lêkolîneran. Ligel vê jî lêkolînên nû tên çêkirin û pirtûkên nû tên çapkirin. Ji wan pirtûkan yek jî di nav weşanên I.B. Taurus de derketiye. Ev pirtûk bi navê "A Modern History of the Kurds (Dîroka Nûjen a Kurdan)" ji aliyê David Mc Dowall ve hatiye nivîsandin. Pirtûk ji 480 rûpelan pêk tê û bi îngilîzî ye.

Di pêşgotina xwe de nivîskar, ji alîkarên xwe re spasîyên xwe pêşkeş dike û wiha dibêje: "Ji hinek kesên ku alîkariya min kirine, ez lêborînê dixwazim, ji ber ku min navê wan ji listeya spasîyê derxistiye. Lewre min nexwest di rewşa Tirkîyeyê ya îro de tiştek bi serê wan were. Hin navan jî êdî ez dikarim bi hêsanî binivîsim. Lewre ew berî niha ji ber raman û nerînên xwe hatin kuştin. Bo nimûne di salên 1992-1994'an de Musa Anter û Medet Serhat hatin kuştin." Di vê listeyê de navên wekî İsmail Beşikçi, Serhat Bucak, Hatip Dicle, İsmet İmset, Celal Talabanî û hwd. hene.

Di destpêka pirtûkê de li ser kesayetiye kurdan û avabûna civaka kurd tê rawestîn û wiha tê gotin: "Serokê dewleta Tirkîyeyê Turgut Özal bi demekekin berî mirina xwe nameyek ji Serokwezîr S. Demirel re şand û wiha got: 'Komara Tirkîye bi tehdîta girîngtirîn re rû bi rû ye. Erdhejêke civakî aliyekî Tirkîye dikare ji timî veqetîne û em hemû jî li bin vê karin bîn temartin' Ev erdheja ku Özal anîbû ziman, serhildana kurdên Tirkîyeyê bû. Di dehsala derbasbûyî de tevgera kurdan li Tirkîyeyê ku bi pêşengiya PKK'ê tê dîkoşe, ji tevgerê çeteyî li serê çiyayên dûr, gihîşt hê-

zeke ku dikare hemû Tirkîyeyê tehdît bike." Di navê beşê de nivîskar behsa hejmar, ax, gel, ziman, ol û civaka kurdan dike. Di beşa yekemîn de dîroka kurdan a ji serdema eşîr û împaratoriye, bi taybetî jî dîroka serdema osmaniyan a ê 19'an heye. Di vê beşê de qala ronakbîrên kurd Abdullah Cawdet û İshaq Sûkutî ku li dijî dewleta Osmanî derketine, lê ne li ser navê neteweperweriya kurd, li ser navê hemwelatîyên Osmanî, tê rawestîn. Di sala 1895'an de dewletê ew şandine mişextiyê li Trîpolî, lê her du jî reviyane Ewropayê. Abdullah Cawdet di nivîseke xwe ya ku di rojnemeya "Kurdistan" ê de hatiye weşandin, li ser tevgera neteweyî ya ermeniyan wiha dibêje: "Divê ermenî û kurd dest bidin hev û bimeşin." Ev jî dide xuyakirin ku, piştî mişextîbûna xwe Abdullah Cawdet bûye neteweperestê kurd.

Di beşa duyemîn de li ser pişaftina kurdan û serhildana Qoçgirî, Komela Azadî, Serhildana Şêx Seîd, Xoybûn, Serhildanên Agirî û Dersîmê tê sekinîn. Di beşên sêyemîn, çaremîn û pencemîn de behsa neteweperweriya kurd li Iraq, Îran û Tirkîyeyê tê kirin. Di beşa neteweperweriya li Tirkîyeyê de du xal hene, yekemîn hişyarbûna neteweyî (kes û rêxistinên berî 1980'yî) ya kurdan û duyemîn jî serhildana PKK'ê. Li ser têkoşîn û dîroka PKK'ê bi firehî tê rawestîn. Her wiha di vê beşê de li ser jiyana Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan jî bi berfirehî tê rawestîn. Der barê dewletê de jî ev tê gotin: "Dewletê xwest ku serhildana PKK'ê bi 'terora li dijî terorê' têk bibe. Li gorî wan heger kurd ji dewletê, bêhtir ji PKK'ê bitirsin ewê bi ser kevin." Piştî re jî nivîskar vê nirxandinê dike: "Ji bo civakeke dewlemend ku di nav tevliheviyêke sîvil de dikarin gelek tiştên xwe berze bikin,



nêrîneke wisa kare rast bibe. Lê di nav rewşeke xizan û bêhêvî de ev nêrîn tenê dikare wê têkoşînê gestir bike."

Li gel nêrînên wî nivîsar ên Özalîst pirtûk bi awayekî objektîf hatiye nivîsandin û hêjayê xwendinê ye.

DILGEŞ SELÇUK / İSKENDERÛN

Agahdariyek li ser PEN'a Kurd

MEDENÎ FERHHO



Di qonaxa îroyîn de, xazulka polîtîk a civaka kurd, ne li gorî dilgermî û hes-tên kesan dizivire. Lê rêveberî û fermandariya civakan pêdiviya hişmendiyêke dûr û dirêj dixwaze. Lewra cudatiya qonaxa polîtîk a îro, ji qonaxên şûnewariyên xwe cudatir û berztir e. Her wiha, cudatî û berziya polîtîkayê îro, bandorê li ser zivîrandina xazulka zarokên kurd ku nû nû ji malzaroka dayikên xwe xelas bûne û nû nû hewa cîhanê têr gemafrî henaseyî kezebên xwe dikin.

Ku em li tevger û têkoşîna îro dinêrin, xazulka çarenûsiyê bê rawestandî dizivire. Bi zivîrandina xazulka civakî re, ya kesan jî, ya zarokên nû bûyî, ya coxrafya, ya nûjenî û guhartina mêtî û hiş û hewn jî dizivire.

Berî salekê, xazulka PEN'a Kurdî ku rawestîya bû, bi têkilî û hinek gavavêtinên zîrek hate zivîrandin. Li Berlînê kongre hate lidarxistin û bi hinek endamên kevn re, yê berendam jî tevî civînê bûn. Yanî xazulka PEN'a Kurd, di yekê reşemîya 1997'an de dest bi zivîrandinê

kir û heya îro, li hemberî asteng û xap û rîpên kurdewarî li mafê xwe geriya û her çiqasî sazî ji hêla navendê ve hatibû sarkirin jî, min ji bo endamtiyê serî lê da. Mixabin bersiv jî nehat ji min re. Têkilî û guhartinên di vê derbarê de bû sedema dawîya nivîsandinên min. Gava herî girîng amadekirina kongreyêke bû. Rêveberiya kevn xwe dabû ber hinek gavên pêşketinî.

Lê, Kekê Yaşar Kaya, heya îro jî, di derbarê PEN'a Kurd de dilbikil e. Bi hêrs û pirs nivîsên xwe didomîne. Bêguman mafê wî ye. Kekê Yaşar Kaya, nivîskar, rewşenbîr û siyasethedarekî berz î kurdan e. Her wiha serokê PKDW'ê ye. Bêhtir ji her kesî binbariya xwe û xwedî li derketina pirsgirêka kurdî, sazî û dezgehên kurdî jî di nav de, li hundir û derve heye. Kekê Yaşar Kaya vî mafî xweş bi kar tîne.

Yek heye... Di nivîsa wî ya 2'ê rezbera 1997'an ku bi navê 'iyi sabahlar (Beyanî baş)' di Özgür polîtîka de hate weşandin, dabaşa nivîskarê berz Recep Maraşlı datîne masetê û rêveberiya PEN'a Kurd tewanbar dike. Ez, yek ji rêveberê PEN'a Kurd im. Ji wateya nivîsan li ser PEN'a Kurd û gera li mafê xwe, ketime wateya bersivdana nivîsên der barê PEN'a Kurd de. Ji ber vê çendê, ez dixwazim ku di pirsgirêka Birêz Recep Maraşlı de, Kekê Yaşar Kaya, komên xelkê, civaka nivîskarên di hêla kirin û pêkanînan de agahdar bikim. Dema rêveberiya me dest bi kar kir, têkilîyên bi PEN'a Kurd re, ji hêla PEN'a Navneteweyî ve hatibû sarkirin.

Lê, rêveberiya me, mîna ku sarkirin li holê nîn be, kar û barê xwe meşand û binbariya xwe anî cih.

Gava yekemîn der barê nivîskarên kurd û ne kurd ku li Tirkîyeyê di girtîgehan de ne, hate avêtin. Birêz Recep Maraşlı jî di nava van kesên payeberz de bû. PEN'a Kurd di 05.02.1997'an de nameyek piştgirî û pejiirandina endamtiya rûmetê ji wan re şand û xwest ku bi wan re bikeve têkilîyê. Her wiha ji kesên mîna Salman Ruşdî û nivîskarê kurd Kerimulah Tewahudî re ku li Îranê hate girtin name hatin şandin û têkilî çêbûn. Ta ku em gihane qonaxa rakirina biryara sarkirina li ser PEN'a Kurd û di kongreya navneteweyî de sedema Birêz Recep Maraşlı jî hate masetê, her wiha di holka navneteweyî de bû dabaşa lê xwedî derketin. Xazulk, tenê di holka polîtîk de nazivire, bi giştî di holên jiyane de dizivire û pir wargeh û qonaxan şûn xwe de dihêle. Da ku pêşeroj li hemberî dirî û striyan bi gulbijêrk û leylandî dilovanî bête xemilandin û mirovên têgihîştî jî, di van holkên jiyane de bi giranî, têgihîştî û berzî dikaribin rola xwe bilîzin.

Rêveberiya PEN'a Kurdî bi mikewnî, di hişmendîya binbariya xwe de ye.

Jêrenot: Piştî nivîsandina vê nivîsê ku kekê Yaşar Kaya ji ber êşa dil ketiye nexweşxaneyê, em jî Birêz Kaya re jiyaneke bi tenduristî û temenekî dirêj dixwazin.

Dilreşê xwarinê



bû dereng.

Xwedyê malê sifreya tijî xwarin, te-
vî tûrek nan li ber mêvan datîne û dibê-
je:

- De kerem bike.

Mêvan binê firiqa yek bi yek rê tavê
dide. Xwedyê malê meraq dike, dipir-
se:

- Gelo gora ku tu wilo ecele dikî xêr
e? Tu bi ku de diherî pismam?

- Bi Xwedê îro çend ro ne ez ne ri-
het im. Xwarina min kêmbûye û ez zê-
de nikarim xwarinê bixwim. Dibêjin
xwedêgiravî ziyaretek li wî gundê hanê
ye û dilê mirov li xwarinê xweş dike.
Ez jî bi wê niyetê ji mal derketime û
Xwedê hez bike ezê herim ziyaretê
çend riket nimêj bikim û destê xwe li
ber Xwedanê jorî vekim, bê Xwedê li
min nayê rihmê.

Gava ku wiha dibêje xwedyê malê
şaş dimîne. Radibe wî bi rê dike û di
ber xwe de dibêje: "Xwedê kirî tu li çû-
nê tu bû mêvanê min, li vegeerê bûbû-
ya, min dê çi xwelî li serê xwe kiriba?
Li hatinê bê tê mala kê xera biki?" û dû
re li mêvan dinihêre û dibêje:

- Xwedê bi te re be, oxira te û xêrê
be, lê belê ku tê li vegeerê werî mala me
ezê jî barê xwe bar kim û herime aş.

AZAD JIYAN

Zilamê xerîb li derfî didê, xwedyê
malê pê ve dertê. Berî ku xwedi-
yê malê jê bipirse zilam dibêje:

- Gelo hûn mêvana dihewî-
nin. Ez mêvanê Xwedê me ji riya dûr
têm, ez betilîme. Ger hûn destûra min
bidin ez dixwazim hebekî bêhna xwe
vedim.

Xwedyê malê dibêje:

- Mêvan mêvanê Xwedê ne, em te
çilo nahewînin. Serseran û serçavan,

kerem bike.

Zilam sola xwe ji piyê xwe dike, lê
belê rûnane û ji xwedyê malê dipirse:

- Gelo hûn nanê nivro jî didin mi-
rov?

- Em çawa nadin? De kerem bike
here rûne.

- Ezê rûnim, belê hûn dikarin şivê jî
didin mirov?

- Erê çawa, emê şivê jî bidine te.

- Hûn paşivê jî didin mêvanên xwe?

- Em paşivê jî didin.

- Taştê?

- Taştê jî.

Gava ku mirov ji mala we derdikeve
û diçe, hûn nanekî duduwan nadin mi-
rov?

- Erê çawa. Nan hevalê rê ye.

- Xwedê ji we razî be, ê de ka bi xê-
ra xwe wê xwarina ku hûnê îro û sibê
bidin min, aniha bînin ber min û ezê
bixwim û bi riya xwe de herim, li min

BI XELAT...

XAÇEPIRSA BI XELAT (86)

XAÇEPIRSA

G	G	H	N	I	T		
Y	U	S	U	F	E	K	Î
L	A	L	T	E	V	E	R
I	D	I	R	A	D	I	A
A	S	E	W	I	A	Y	A
A	N	I	N	I	P	R	I
G	R	A	N	S	I		
A	V	A	K	A	R		
A	Z	I	N	E	Y	I	
E	V	I	N	K	I	N	

Bersiva Xaçepirsa 84'an

Xaçepirsa me bi xelat e.
Di 15 rojan de çî bersiv
bigihîjin me, emê wan
binirxînin û bi riya pişkê li 5
kesan belav bikin.
Xelata hejmarê me ya 86'an,
Kaseta Xelîl Xemgîn
(NAME) ye.




Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê
nirxandin, divê hûn
"Peşya Veşarî" di nava
qutiyên li bin xaçepirsê de
binivîsin û tevî navnîşana
xwe ji me re bişînin.

Pênc kesên ku xelata xaçepirsa hejmarê 84'an kaseta
Xanemîr (Welatê Rojê) ye: Di xaçepirsa vê hejmarê de
hinek xelatê hebûn, ji ber vê yekê em xelatê didin hemû
bersivên ku ji me re hatine şandin: Yılmaz Demirci/Mêrdîn,
Yılmaz Suncak/Semsûr

Amojgeh Şehidek (wêne)	Felaket Ev sal	Çik Yekitiya Neteweyî	Haceti Kurtuya pereyên tirk	Mam Serhildêr Endam	2
1					Çek û...
Hêsan Daçekek	6		Madekiri Robar	5	
		Hemû	Bi kirdkî rû Saf		Ajanseke tirkan
Bi tirkî dest Cinavkeki kesane		Poçik Torin			Baneşa nek
	4	Hew Tiyatro		7	Hewl, danexwe Hinan
Ev şev Tipeke kurdî			Notayek Ceng		
3	Kovareke kurdî Bi tirkî tenî				
Roja berî şemiyê Ûfq			Cephe		
		Şimendi fer			

PEŞYA VEŞARÎ





Destpêk: Rûpel 3

Kanî Xulam bal kişand ser karsazê Lubanî Roger Tamraz û da zanîn ku, vî kesî li ser navê Tansu Çillerê ji Clinton re hevdi-tin çêkirine, lê niha rojnameyên DYA'yî radigihînin ku Roger Tamraz Tansu Çiller xapandiye.

Nivîskar û lêkolîner Suat Parlar jî ji bo heman babetê bi taybetî bal kişand ser nexweşiyên di navbera Tîrkiye û Azerbeycanê û diyar kir ku xetên neftê jî bilî girîngiya wan a stratejîk bi kêrî tiştekî nayê. Parlar axaftina xwe wiha domand: "Li Azerbeycanê bi destkariya kontrayên Tîrkiyeyê darbeyek hate lidarxistin. Ku ev pirsgirêk neyên çareserkerin mirov nikare qala avakirina xeta neftê bike. Şerê li serçaviya kaniyê neqediya. Bila berî her tiştî bi birayên xwe yên azêrî re li hev bînin! Ez zêde baweriya xwe bi vê projeyê nayim."

Nivîskarê rojnameya Hêvî Edîp Polat jî bal kişand ser stratejîkbûna Kurdistanê û da xuyakirin ku, ji bona ku welatê kurdan li ser çateriyên Asyaya Navîn, Rohilata Nêz û Dûr e, di herêmê de roleke gelekî mezin dilîze. Ji ber vê yekê guhastina neftê girêdayî çareserkerina kêşeya kurd e.

Di avakirina xetê de Rola PKK

Li aliyên din tê ragihandin ku di pêk hatina vê projeyê de rêdana PKK an jî çareserkerina kêşeya Kurdistanê cihekî girîng digire. Ev mijar piştî hikûmetê tê rojva MGK'ê jî. Tê daxuyandina ku MGK jî wê di

civîna xwe ya di 26 rezberê de li ser vê mijarê û bandora PKK'ê ya li ser-projeyê raweste. Tirs û xema dewleta tirk a li dijî bicîhbûna gerîla ya li Behra Reş bi vê yekê ve tê girêdan. Ev xeta boriyan di bajarên wekî Sêwaz, Erzurom, Erzîngan, Tokat û Qayserî re derbas dibe. Tê dîtin ku çalakiyên gerîla jî li herêmê gur dibin. Endamê PKDW Ahmet Aktaş li ser vê yekê diyar kir ku di vî warî de girîngiya PKK gelekî mezin e û wiha axîvî: "Li gorî hin saloxan jî bo pêkanîna vê projeyê razîbûna PKK pêwîst tê dîtin. Tê gotin ku li ser vî esasi hevdi-tin çêbûne."

Kanî Xulam jî diyar kir ku bi dîtina wî di nav van şertan de PKK rê nade projeyê bi vî rengî û got ku kes nikare helwesta hêzeke ku heya Behra Reş û Behra Spî belav bûye di ser guhê xwe re biavêje. Piştî wî got, şirketên navneteweyî bi dudilî nêzîkî vê projeyê dibin û ev mijar jixwe di kûlîsan de tê nîqaşkirin. Nivîskar Edîp Polat jî diyar kir ku heke bêyî destûra PKK'ê boriyên neftê di Kurdistanê re derbas bibin, wê bi êrişên gerîla zirareke mezin bigihîje dewletê. Lê ev tişt bi serê dikare li projeyê bibin asteng? Ji bo bersivandina vê pirsê hîn zû ye.

Ş. Elekdağ: Aştiyeke mayinde pêwîst e

Di vî warî de balkêştirîn nivîs ji aliyê nivîskarê rojnameya Milliyetê Şükrü Elekdağ ve di roja 18 gelawêja 1997'an de hatibû nivîsin. Elekdağ, têkoşîna jî bo nefta Behra Hazarê wekî "Ji nû ve lihevpar kirina nefta

cîhanê" bi nav kir û da zanîn ku, ji bo ku Xeta Bakû-Ceyhanê bê pejirandin divê Tîrkiye li "Rohilata Anatoliyê" aştiyeke mayinde (kalıcı) pêk bîne. Dîsa li gorî ragihandina Elekdağ, DYA ve projeyê gelekî girîng dibîne û dixwaze li herêmê aramî û aşî çêbe. Tê ragihandin ku ev proje dibe ku ji bo çareserîya kêşeya Kurdistanê hin gavan bi dewleta tirk bide avêtin. Li ser vê yekê Ahmet Aktaş bal kişand ser polîtîkayên hikûmeta nû û got ku, niyeta hikûmeta nû jî bo dîtina çareseriyê nîn e. Kanî Xulam jî, gotinên Balyozê (Büyükelçi) berê yê Fransayê yê Enqereyê Eric Roluea yê wekî "Kêşeya kurd Tîrkiye dîl girtiye." bi birxistin û diyar kir ku ev rewş hîna neguheriye. Xulam wîsa berdewam kir: "Di warê çareserkerina kêşeya kurd de hîna zelaliyek nîn e. Ji bo vê divê bi pêşengên kurdan re li hev rûnin. An na wekî ku Dr. Haluk Gerger gotibû, wê gelê kurd û gelê tirk ji Dehaqên nûjen bifilitîne" Edîp Polat jî bal kişand ser reaksiyona dewleta tirk a li hemberî Trêna Aştiyê û ragihand ku heger dilê dewletê hebûya ku ber bi aşiyê hin gavan biavêje, ev projê qedexe nedikir. Polat axaftina xwe wiha girêda: "Dewleteke wilo ku hebûna mafên kurdan napejirîne, çi jê tê dike, dev ji hemû berjewendiyên xwe berdaye. Gelo wê jî bo Nefta Hazarê gavekê biavêje? Heke nefta Hazarê ji berê ku ji Kurdistanê bi dest dixê, bi hêjatir bibîne, wê hin gavan bavêje."

MAZLÛM DOĞAN

WELAT

Rojnameya Hefteyî (Haftalık Gazete)

Li ser navê Zerya Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) CELALETTİN YÖYLER

NAVNÎŞAN Ayhan Işık Sk. No:23/3 Beyoğlu / İSTANBUL TEL-FAX (0 212) 251 90 13

Gerînendeyê Weşanê (Yayın Yönetmeni) SAMİ TAN

Berpirsê Karên Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) M. SALİH TAŞKESEN

Berpirsê Saziye (Müessese Müdürü) TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

BELAVKIRIN BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME (Temsilciliklerimiz)

Munchen: (Nünerê Giştî yê Ewropayê) Mahmut Gergerli 49 871-67 08 84

Brüksel: Medenî Ferho 32 532 721 12 03

Suriye: Jan Dost Helim Yûsiy

Berlin: Silêman Sîdo 00 49 30 691 6495

Hannover: Selim Biçûk 49 572 18 13 60

Stockholm: Robîn Rewşen 46 87 51 05 64

Bonn: Ahmet Baraçkılıç 49 228 66 62 49

Hollanda: S: A. Fowzi 31 104 85 55 43

afirîner: xuliqîner (yaraticı)
amojgeh: înstîtu
azîne: rêbaz, metod
belam: lê, lê belê
binbarî: berpirsî, mesûliyet
çarenûsi: qedêr
çewisandin: pest û pêkutî, zordarî
çilo: çawa, çito, çer
dabaş: mijar, babet, mewzû
dadmendî: hiqûqî
derfet: îmkan
erjeng: tirsnak(korkunç)
gelemşe: pirsgirêk, alozî, arîşe
gengeşî: gotûbêj, nîqaş,
guhastin: taşîma

Ferhengok
guncan: guncaw, mûsait
goyîn: üveyik kuşu
henase: hilm, nefes
hevok: komek, cumle
hevrê: rêheval (yoldaş)
hişaza: azad, serbest
hişmendî: zanebûn, bîşîr
holk: gastîn, qad, pêgeh
hût: dev, kesê gir û qelew
metel mayîn: şaş mayîn.
mikewnî: kevaniya jêhatî
mişextî: qaçaxtî
neffî: sirgûn, derketî

pastoral: pesar û seyran
parkît: paşgir, paşpirtik (sonek)
pêdivî: pêwîstî, hewcedarî
pêşeroj: diwaroj, dahatû (gelecek)
pêrkît: pêşgir (önek)
qirn: sedsal, asîr
qaso: xwedêgiravî (sözde)
saw: tirs, xof
şareza: pispor, medenî
şor: gotîn, kelam
şorker: axîfger,
ting: sergo, çop
xazûlka: vizik, çirçirik (topaç)
werz: demsal, mewsim
zîrek: zereng, jîrek

Teyrekî windabûyî Wênesaz

Mihemed Henîf Berîm



Di wênesaziya Mihemed Henîf de keçikên kurdan bi dimenên evîndariyê de rûyên wan sor dikin, dema ku li ser tabloyê evîndariya welat tê xuyakirin, tê dîtîn ku birq û tîrêjên hezkirina welat ji çavên wan diavêjin.

nêtiyê ji ser wî rakim û bavêjim.

Hunermendê hêja ji min re got: "Hevalê hêja fermo li nêzik min rûne û dest ji hevpeyvînan berde, lewra te bi xwe re peyamên (nûçe) ji pismam û lêziman û bêhna zeytûnên welat û bêhna çiyayên wî anîne."

Min di dilê xwe de biryar da û got pir pêwist e ku ez li ser rewşa hevalê hêja Mihemed Henîf ji Rojnameya Azadiya Welat re binivîsim, piştê ku ez demek dirêj bi wî "teyrê windabûyî" re axivim min got: "Gelo kî ye Mihemed Helîm Berîm?"

Li bajarê Helebê li zanîngeha bajarê Helebê di beşa perwerdehî û Fîziyolojiyê de ders daye. Her wisa di zanîngeha Helebê de di beşa hunerê de jî ders daye. Hem jî tevli birekî konferansên zanistî bûye, li Sûriyeyê. Ji ber encamên hinek bûyerên nexweş di hinekî demên taybet de hem jî ji ber demên xirabiyên ku gelê wî ye kurd tê de dijît, bê çare ma ku bibe rêwiyê çûyina Lubnanê û li bajarê Beyrûtê bi cih bû û di sala 1995'an de konferanseke mezin li dar xist, di wê konfiransa wî de, pir kes ji hêla hikûmeta Lubnanê û kesayetiyên hunermend û rojnemevanên Lubnanî cih girtin.

Dema ku mirov dikeve hundirê Wênexana vî hunermendê bi rûmet, mirov rastê nexseyeke, ku ji rengên nexweşî û dîlkulî û rûgeşî û dîlxweşiya gelê kurd di nav de diyar e, tê. Min ji wênesazê birêz pirsî: "Gelo çima tê wê wênexaneya xwe di vî cihî de çêkirîye, ku berê wê li Helebê dinêre", ji min re got: "Ji bo ku her sibê, dema min çavên xwe vekirin ez vî çiyayî bibînim. Lewre ev çiyayê hanê çiyayê welatê min e ku ez bi zarotî hetanî xortaniya min de bi her awayê dijwarî û xweşiyê hambêz kiribûm."

Bi kurtayî Henîf Berîm bi xwe çavekî bi wêneye ji bo jiyana û rewşa bajarê Efrînê. Cihêkî wênesaziya wî hevalî yî pir mezin heye di nav xebata wî ya li Efrînê de. Hunermendê hêja, bi wênesaziya xwe ya bedew, reng û rewşên cur bi cur ên folklorê gelê kurd û bazara wî û çiya û jiyana karker, palêyên wî; rewşa jinên ku ref bi ref ber bi zevî û baxçeyan dimeşin, bi reng û rûçikên bimîrûz û tîrêjên ku di nav de hestê û daxwazên wan de ji jor ve didine ser rûyên wan, dide diyarkirin.

Bi rastî wênesaziya hunermend Mihemed Henîf Berîm niha ji dîtina berçavî wergeriyaye bal watêyên pir bi raz û nixandinên hêja. Li wir em diponijîn û dibêjin hinek jî xwedûrxistina hunermend a ji welat, ji gel, ji ber vê yekê ye ku xwestiyê evîndariya xwe ji bo heyberan (mahlûqat) bi navgîniya wênesaziye wergerîne evîndariyekî pir mezin. Ew jî evîndariya welat bi xwe ye. Ev evîndarî

jî di nav lêkolîn û hûmêrî-nên li ser rengên wan tabloyên wî de tene diyarkirin. Hem jî divê ku cihan di deriyê wî re xwe berde navê, ne ku di pencereya wî re. Wê demê em bizivirin bal wênesaz û hunera Mihemed Henîf û destên xwe li ser bedenên tabloyên wî yên renga reng bigerin û li ser wan rûyên ku rengên sor û porteqal ku şax şaxî ne, ber bi çarçovên wan tabloyên hêja û delal. Hem jî li ser wan rûyên dayîk û xwişkên ku li ser rûyên wan hem evîndarî hem jî keder û bêhêvîti bi hev re heye, ew keder û mirûziya ku qiz û keçên kurdan di dil û çavên xwede her tim digerin.

Di wênesaziya Mihemed Henîf de keçikên kurdan bi dimenên evîndariyê de rûyên wan sor dikin, de-



ma ku li ser tabloyê evîndariya welat tê xuyakirin, tê dîtîn ku birq û tîrêjên hezkirina welat ji çavên wan davêjin.

Zana û hunermend Mihemed Henîf Berîm zanayekî tîr gihîştîye. Bi mîhrîcanên tabloyên wî yên renga reng, zanayekî ji goşt û xwînê derdikeve berçavê mirov. Ew dijwariya jiyana bi dilpakî û ramanên xwe yên bêhempa dike. Ev tîştê ku mirov bi demên dirêj dide rawestîn ji bo ku mirov li ser razên (sir) ku di bedewiya tabloyên wî, di piştê rûyên ku wekî rewneqan xwe didine raxistinê de

lêkolînan bide meşandin. Dema mirov nêzikî kulîlkên wî dibe ew dibe destpêka ronahîkirina dîroka gelekî ku şer û cengê ji bona azadiyê û mirovahiyê dike.

Ev beşek pir piçûk e ji jiyana hunermend, Mihemed Henîf. Daxwaz û armanca min ji nivîsandina vî mijarê ew e ku ez perdeyê ji ser razên wênesaziya hunermendê kurd ê hêja bidime rakirin. Lewre ew digel hunermendî û kurdûnê xwe doza azadiyê dike.

RESAD YÜSIV

Jİ EREBÎ: CELAETTİN YÖYLER

Ji pênc salan bêhtir bû ku ez rastî "Hunermendê wênesaz Mihemed Henîf" nehatibûm. Ew hunermendê ku xebateke hunerî ya pir hêja ji gelê Kurdistanê Başûrê Biçûk re kiribû. Lê pir mixabin ew ji ber hinek sedemên kesane, ji heval û hogir ji pismam lêzimê xwe qetiya û berê xwe da Beyrûtê, lewre li wir bi hindikî be jî serbestî û demokrasî hebû.

Ji ber ku hem xudanê hunera wênesaziye hem jî kurd bû, di nav dijwariyên giran re derbas bûbû. Ew dema ku li Beyrûtê bû, ji ber hesreta welat, bermayên zeytûnên welat her tim di tûrikê xwe de vedîştartin. Di bîra wî de, di serê wî de, di dilê wî de, tim xewn û bîranînên ku ew dibir welat hebûn. Hem jî di bîra wî de her çûn ber bi gundê wî ye çiyayî li bajarê Efrînê hebû. Ew gundê wî ye bi navê "Me emel uşaxî" cihê jî dayîk bûna wî bû. Ew gundê ku bi çiyayên hawîrdorên xwe ve hatiye dorpeçkirin, ew gundê ku êş û jana wî veşartîne di sax û mesîlên wî, di newal û deşt baniyên wî de, ew deştên ku vebûne û dirêj bûne, bi bal bax û baxçeyên zeytûn û qadên darên belotên wî...

Piştî ku me hev dît, ez bi demek dirêj digel Mihemed Henîf rûniştim. Me ji kes û lêziman, ji welat, ji xerîbiyê xeber da, me ji bajarê Efrînê ji perîşanê û belangaziya gelê kurd, ji hunerê, ji zivîrîna welat, ji evîndariya welatê ku hevalê Mihemed Henîf, wê evîne li pişt birek çiya hiştibû, ew evîna ku bi dem û salan li benda wê bû.

Di nava hevpeyvînan xwe de min ji wênesazê hêja Mihemed re qala Rojnameya Azadiya Welat kir û jê daxwaza hevpeyvînekê kir. Wî jî got: "Hevalê hêja, hêji heye ku xwe gihandina rojnameyê bibe navgîn û pirê ji bo xwe gihandina min bi bal neteweya min û heval hogir û malbata min."

Bi van daxuyaniyên wî re min bi lez pêniş û çend pel amade kirin, ji bo ku em dest bi hevpeyvîne bikin, li Mihemed Henîf ew daxwaza min red kir, ji bo ku dixwest ku bi tenê bimîne xwe eşkere neke, ez jî hatibûm ku wê perdeya bi te-